HAWAR
Rojnameya Rojane
12 Gulan 2009
Sêşem
Sal: 1
Hejmar: 7
Buha: 50 Kr

DUETA DENGBÊJÎ Û ROCKÊ JÎ PÊK HAT

## Li Stenbolê dueteke cihê

Koma navdar a muzîka rockê Storybox, bi dengbêjên kurd yên ciwan re konserek da. Konserê ji mUzîkhezan eleqeyeke germ dît. Ji dengbêjên ciwan yên kurd Mîhemedê Serhedî, Baran Botan û Ayfer Duzdaş, di konserê de bi Storyboxê dueta rock û ya dengbêjiyê kirin... RÛPEL - 6



### TZPKurdî der barê Cejna Zimanê Kurdî de daxuyaniyek da

# ‘Cejn ne 14 lê 15’ê gulanê ye’

**Lijneya Ahengîsaz a TZPKurdî bi daxuyanikeyê aşkera kir ku divê kurd 15’ê Gulanê roja Cejna Zimanê Kurdî weke cejneke neteweyî pîroz bikin. Hate diyarkirin ku Cejna Zimanê Kurdî ne 14’ê mehê ye, cejn roja 15’ê Gulanê ye**


Di daxuyaniyê de sedema ku roja 15’ê gulanê wek cejn hatiye diyarkirin wiha hatiye vegotin: “Roja derketina kovara HAWAR’ê ye. Ev roj roja Cejna Zimanê Kurdî ye. Her çiqas hin derdor 14’ê gulanê wekî roja Cejna Zimanê Kurdî bibînin jî, tu wateyeke 14’ê gulanê ji bo zimanê kurdî tune ye û gelê kurd vê rojê wekî roja cejna zimanê xwe nabîne. Em bang li hemû gelê xwe dikin ku îsal ji hemû salan bêtir di navbera 15-22’yê gulanê de beşdarî çalakiyên Cejna Zimanê Kurdî bibin û têkoşîna parastin û pêşxistina zimanê xwe bigihînin asta herî jor. Roj roja xwedîlêderketina li zimanê kurdî ye. Roj roja bilindkirina têkoşîna parastin û pêşxistina zimanê kurdî ye û roj roja bilindkirina têkoşîna azadiya zimanê kurdî ye.”... RÛPEL - 6

## Li Stutgartê fîlmên kurdî

*Li Stutgarta* Almanyayê 2’yemîn Rojên Fîlmên Kurdî ji aliyê Yekîtiya Xwendekarên Kurd (YXK) ve hate lidarxistin. Rojên Fîlmên Kurdî bi fîlmê Kazim Oz ‘Bahoz’ dest pê kir û bi fîlmê Huseyîn Karabey ‘Çûyîn’ bi dawî bû. Her wiha belgefîlmê ‘Qelema Sure’ ku derhêneriya wî Ozgur Findik kiriye, fîlmê Bahman Ghobadî ‘Nîvê Heyvê’, belgefîlmê Yuksel Yavuz ‘Plana li ber çav Kurdistan’, belgefîlmê Aydin Sevînç ‘Gozmece’ û kurtefîlmê Arîn Înan Aslan ‘Sî û Ba’ hatin nîşandan.

## Şehîdên çand û hunerê hatin bibîranîn

**Şehîdên çand û hunera kurdî di 11’ê gulanê de hatin bibîranîn. TEV-ÇAND’ê bi wesîleya roja şehîdên çand û hunerê daxuyaniyek weşand. Her wiha hunermenda kurd Gurbet Aydin di 18’emîn salvegera şehadeta xwe de li Qadên Parastinê yên Medyayê hate bibîranîn. Tev-Çandê di daxuyaniyê de diyar kir ku hunermendên ku di Têkoşîna Azadiya Kurd de jiyana xwe ji dest dane, bi jiyan û afirîneriya xwe bûne çavkaniyên hunera Kurdistanê… RÛPEL 6**


Gurbet AYDIN

# EV ÇI YE?

Di van rojên ku li Tirkiyeyê nîqaşên êrênî yên ji bo çareseriya demokratîk û aştiyane tên meşandin de li Colemêrgê tiştên balkêş qewimin. Îranê bajaroka Bajêrgehê da ber topan, leşkeran li Elbakê welatiyek gulebaran kir û kuşt. Balkêş e ku heta niha tu rayaderên leşkerî û siyasî der barê mijarê de tu daxuyaniyên fermî nedane



### ÎRANÊ NAVENDA BAJÊRGEHÊ BOMBEBARAN KIR

Artêşa Îranê cara yekemîn dever û gundên sivîl ên li aliyê sînorê Tirkiyeyê bombebaran kirin. Ligel ku topên Artêşa Îranê li nava Bajêrgehê (Esendere) ketin û wesayîtên şaredariyê zirareke mezin dîtin jî heta niha tu daxuyanî ji aliyê rayedarên mulkî û îdarî yên dewletê ve nehatine dayîn. Her wiha di nava niştecihên bajarokê de tirs û fikareke mezin peyda bû. Li gorî şîroveyên siyasetmedaran ev hewldan nîşana provokasyonên xeternak in û hate gotin ku armanca Îranê û hin derdorên li Tirkiyeyê ew e ku zemîna nîqaşên li ser çareseriya aştiyane û demokratîk ji holê bên rakirin.

### GELO WALÎ AN FERMANDAR RAST DIBÊJE?

Her wiha di nava rojê de li vê deverê topebarana Artêşa Îranê dewam kir û gundê Kokepê bi giranî hate bombebarankirin. Piştî bombebaranê gund ji hêla leşkerên Artêşa Tirk ve hate valakirin. Li ser daxwaza fermandarên leşkerî yên Qereqolê gundiyan malên xwe terikandin. Li gorî agahiyên ku gundiyan dan; fermandarê leşkerî hatiye gund, ji gundiyan re gotiye ku wan biryara valakirina gund daye û lewre ji wan xwestiye ku demildest gund vala bikin. Ligel daxwaza leşkeran a valakirina gund jî, Waliyê Colemêrgê daxuyaniyek da û got biryara wan a valakirina gundan tune ye.

### LEŞKERAN LI ELBAKÊ KURDEK QETIL KIR

Ne tenê Artêşa Îranê êrîşî kurdên sivîl kir. Artêşa Tirk jî li cihê xwe nema û welatiyek qetil kir. Welatiyê bi navê Savaş Ozturk ku ji bo danûstandinê çûye gundê Xaşkana Elbakê rastî gulebarana leşkeran hat. Hate angaştin leşkeran bi hinceta ew qaçaxvaniya mazotê dike, Ozturk rawestand. Hate ragihandin ku li ser vê yekê di navbera leşker û gundiyan de nîqaş derketiye. Hate daxuyandin ku leşkeran li ser vê yekê Ozturk gulebaran kiriye û Ozturk li cihê bûyerê jiyana xwe ji dest daye. Birê Ozturk, Veysî Ozturk anî ziman ku leşkeran birê wî gulebaran kiriye û cenazeyê wî li nava gund hiştine... RÛPEL - 3

## Srî Lankayê hezar û 200 sivîl qetil kirin



**ARTÊŞA** Srî Lankayê li welatê tamîlan Mullaiththeevuyê qetliam pêk anî. Peywirdarên tenduristiyê gotin ku wan li ‘herêma ewlehiyê’ zêdetirî hezar û 200 cesedên sivîlan hejmartine. Artêşa Srî Lankayê roja şemiyê bi balafiran êrîş birûbû ser herêmê. Hate hînbûn ku di encama êrîşa hewayî de Berdevkê Leşkerî yê Pilingên Tamîlan jî birîndar bûye... RÛPEL - 4

## Gelo dê dewlet bikare siyaseta fermî ya dewletê biguherîne?

Serokomarê Dewleta Tirk Abdullah Gul di meha adarê de dema diçû Tehranê gotibû ‘di warê pirsgirêka kurd de dê tiştên baş çêbin’. Duh Gerînendeyê Giştî yê Radîkalê naveroka sohbeta xwe ya bi Erdogan re weşand. Wezîrê Karên Hundir Atalay îşaretên ji bo vegera Erdogan a ser konsepta 2005’ê... RÛPEL - 4



## Li Êlihê 6 gorên tomerî hatin dîtin

Serokê Baroya Êlihê Yusuf Tanrisever got ku li çiyayê Helkisê ku di navbera Sason û Hezoyê de ye li 6 cihên cuda hestiyên mirovan tevî cil û solên wan ji aliyê gundiyan ve hatine dîtin. Tanrisever, wiha got: “Li gorî şahidên bûyerê li quntarên çiyayê Helkisê li 6 noqteyên cuda hestiyên mirovan hatine tespîtkirin. Li gorî wêneyên li cihê bûyerê hatine kişandin, li hin cihan ji cesedekî zêdetir hestî hene. Bi awayekî zelal xuya dike ku cesed tevî cil û solên xwe hatine binaxkirin. Di vê sedsalê de hê jî dîtina gorên tomerî rewşeke wahîm e.”

www.arsivakurd.org

## Şewirgeh

Cemal Şerîk

# Cerdevanî ber bi ku ve diçe?

Komkujiya li Mêrdînê ya bi destê cerdevanan hatî kirin tê gotûbêjkirin. Lê hê hikûmet cerdevaniyê ji vê komkujiyê berpirsiyar nagire. Artêş jî ji gotûbêjên li ser rakirina cerdevaniyê ne rihet e.

Kesên cerdevaniyê sûcdar nabînin dixwazin serê sûc bigirin. Cerdevan ne ji vê bûyerê tenê berpirsiyar in; cerdevanan tevan bêguman sûc kirine. Lê ji ber ku di bin parastina dewletê de ne, piraniya sûcên wan tên veşartin, an jî gel ji tirsan nayne ziman, newêre gilî bike.

Çawa ku tê zanîn çi kesê li hemberî tevgera azadiya Kurd be, mafê wî heye sûc bike. Yên li hemberî Apo û PKK'ê cuda tên girtin, tên parastin û ti kes nikare nêzîkî wan bibe. Ji ber wê di salên 1990î de di aliyê aborî, civakî û siyasî de berjewendî derketine meydanê.

Di bin navê dijberiya Apo û PKK'ê de her xirabî hatiye kirin. Çiqas kirinên derveyî hiqûq hene tev hatine kirin. Ev maf bi xwe re dîtine. Ev kesên dilxwede welatperwer berîkên xwe dagirtine.

Yên navên wan di doza Ergenekonê de derbas dibin jî mafê xwe dibînin ku li hemberî PKK'ê bên xelaltkirin. Dibêjin li hemberî PKK'ê me şer kiriye, ji ber wê her tişt mafê me ye. Sûcên kirîn bi van behaneyan kirine, bi van hestan kirine. Ya herî xirab jî dema ev sûc kirîn fikirîne ku ti kes nikare pirsê ji wan bike û wan darizîne. Cerdevanan jî li cihê ku lê ne, mafê parastin û destnedanê bi dest xistiye. Ji ber wê hema hema tevan sûc kiriye. Lê Tirkiyeyê ceseret bi xwe re nedîtiye ku sûcên wan bêxe lêpirsîne. Ji bilî tevgera azadiya Kurd û ÎHD'ê ti kesî ev mijar neaniye rojevê û bi israr li ser nesekiniye.

Lewre rexnekirina cerdevaniyê tê wateya rexnekirina siyaseta dewlet û hikûmetê. Rexnekirina cerdevaniyê tê wateya dijberiya artêşê. Li Tirkiyeyê yên vê cesaretê bi xwe re dibînin pir kêm in. Yên rexne dikin jî rastiyan tevan dernaxin meydanê.

Artêş bi awayekî eşkere li cerdevaniyê xwedî derdikeve. Çawa ku dema leşker û polîs tên rexnekirin tê gotin hûn bi rexneyên xwe têkoşîna li hemberî terorê lewaz dikin, li hemberî rexneyên li ser cerdevaniyê jî heman nerazîbûnên xwe tînin ziman.

Çawa ku di vê bûyerê de jî gotin divê cerdevanî ji vê bûyerê berpirsiyar neyê girtin. Bi vê, xwestin pêşiya rexneyên li ser cerdevaniyê bigirin. Piştî ku artêş bi vî awayî li cerdevaniyê xwedî derkeve, eşkere ye ku wê cerdevan her tiştî bikin.

Bi pêmana vê bûyerê piraniya sedem û rastiyên tên gotûbêjkirin encamên cerdevaniyê ne. Sedemê ku bihevçûnên berjewendiyan jî tên kirin dîsa encamên cerdevaniyê ne. Hirsa dewlemendiyê jî encama cerdevaniyê ye. Kapîtalîzim di herkesî de hirsa maddiyetê pêş dixe; ev rast e, lêbelê tişta wisa kirî ku ev hirs ber bi harbûnê ve biçe cerdevanî ye.

Li Kurdistanê eşîrtî hê zindî ye. Kesên eşîrtiyê ji vê bûyerê berpirsiyar digirin, dixwazin rastiyê berûvacî bikin. Lewre di nava eşîrên din de bûyerên wiha neqewimîne. Her eşîr dizane eger serî li tiştekî wiha bidin wê ji aliyê civakê ve neyê qebûlkirin.

Ji ber wê serî li tiştên wiha nedane. Lê tişta ku eşîrtî xistî rewşeke wisa ku bi rêzik û qanûnan ve girêdayî nemîne, dîsa cerdevanî ye. Çawa ku eşîrên bûyên cerdevan tev ji nirxên eşîrtiyê jî dûr ketine û bûne çete.

Di serî de yên cerdevanî qebûl kirîn, cerdevaniyê mîzana civaka Kurdistanê xirab kiriye. Cerdevaniyê çîneke ku bibe bela serê Kurdistanê derxistiye holê. Cerdevanî ji aliyê dewletê ve hatiye afirandin û bûye çîneke paşverû û çete.

Ji ber wê, ji tiştên tên dîtin û tên zanîn hê pirtir cerdevan di bin parastina dewletê de ne û bûne civakeke sûcdar. Êdî cerdevanî li Kurdistanê bûye nexweşiyeke weke kansêrê. Xirabiyên bi cerdevaniyê derketîn hezar qatî ji bûyera Mêrdînê pirtir in.

Têkiliyên di navbera gelê Kurd û cerdevanan de weke têkiliyên di navebera hucereyên saxlem û hucreyên bikanser bi pirsgirêk in. Cerdevan derveyî civaka Kurd in. Kesê bi tevayî li derveyî civakê bimîne, ka wê rewşa wî ya ruhî çawa be, rewşa cerdevanan jî ew e. Cerdevan bûne dijminê civaka ji navê derketîn.

Îro cerdevan tev di aliyê psîkolojîk de nexweş in. Cerdevan civakeke bi nexweşî ye. Di aliyê psîkolojîk de ne li ser hişê xwe ne. Her demê ji bo her xirabiyê amade ne. Heta ku bi civaka Kurdistanê ya ji navê derketîn re nebin yek, wê ev nexweşiya wan dom bike. Tu tedawî nikare bi tevayî cerdevanan baş bike. Riya ku cerdevanan ji nexweşiyê rizgar bike ew e ku vegerin nava civaka ji navê derketîn. Heta ku ev rastî neyê dîtin çi nirxandinên li ser cerdevaniyê bên kirin wê ne rast bin. Ji komkujiya dawî cerdevanî berpirsiyar e. Cerdevanî her roj parçe parçe sûcên wiha dike. Cerdevanê sûc nekirî tevlî gemarê nebûyî nemaye. Ji ber wê, bê ku rojek jî dereng bimîne, divê sîstema cerdevaniyê bê rakirin.

Pêwîst e ji bo ti behaneyan rakirina cerdevaniyê neyê başxistin. Bêguman pêwîst e ji bo rewşa wan ya aborî û civakî dewlet xwdiyê siyasetekê be.

Ji bo lêpirsîna vê bûyerê li meclisê komisyon tê avakirin, lê cih nadin DTP'ê. Lewre DTP dixwaze cerdevanî rabe. Yên ku weke artêşê naxwazin cerdevanî rabe, DTP li derve hiştine. Tirsiyane ku wê DTP nêrîna dewletê ya fermî aşkera bike.

Komisyona hatiye hilbijartin, weke rayedarên hikûmetê gotîn, dê hewl bidin nerazîbûnên gel sivik bikin. Lê di nava demê de dê ev bûyer bê jibîrkirin û heta bûyereke din wê cerdevanî li derveyî gotûbêjan bimîne.



## Şîrove



Ahmet Aktaş
saktas25@hotmail.com

# Li Qendîlê H.Cemal û H.Cemal!

Li navenda dilê Kurdistandê; li Qendilê, rojnamevan **Hasan Cemal** û **Heval Cemal**, bi hev re gotûbêjeke dûr û dirêj kirin.

Piştî guftûgoya **M. Ali Birand** bi **Rêber Apo** re li Lubnanê kir, ev cara duwem e ku guftûgoya bi rêveberekî PKK'ê re çêdibe ewqas û deng vedide.

Bêguman sedemên vê deng derxistinê hene. Lê ji sedeman bêhtir ez ê li ser aliyên balkêş ên vê guftûgoya duwem rawestim.

Erê guftûgoya bi **Rêber APO** re bêhtir deng veda, helbet sedêmên wê diyar in, lê mijara balkêş ev e ku, li ser vê bûyerê Dewleta Tirkiyeyê xwe gelek aciz kir û zêde hêrs bû.

Lê li ser vê ya duwem, hema hema bêje ne hêrs bû û nerazîbûn jî diyar nekir. Li gorî saloxan giregirên dewletê; serokomar, serokwezîr, wezîrê karûbarên derve û hwd. xwestine **Hasan Cemal** bibînin û li ser vê gera wî bi axivin û dîtinên wî bistînin.

Ev xweşbîniya rêveberên dewletê ji vê bûyerê re, gumanê mirovan xurt dike ku **H. Cemal** bi karekî misyonerî rabûye.

Ji ditîn û şîroveyên hinek nivîskar û rojnamevanên navdar jî, ên li ser vê gera **Hasan Cemal**, ev guman xurtir dibe. Hema hema weke bêje, ma dewleta me çima karekî wisa neda me? Heta weke bêhna hesûdiyê ji van nivîsên wan tê.

Her wiha çapemenî û medyaya Tirkiyeyê jî, weke carên berê bi bêedebiyên mezin ev nûçe û guftûgo neweşandin, heta mirov dikare bêje piraniya wan hinekî objektîf jî dan û hinekan ji wan bi xweşbînî weşan kirin.

* * *

Serokomar **Abdullah Gul**, bi hemû serokên partiyên li Parlamentoyê ne ra axivî. Her wiha bi Serokê DTP'ê **Ahmet Turk** re jî axivî, ka **Receb** dê ji kerê xwe yê iblîs peya bibe û ligel **A. Turk** danişe an na, hîn jî ne diyar e!

Wezîrê Karûbarên Derve **Ahmet Davudoglu** diçe DYA'yê.

Sibê hinek civînên girîng dibin; civîna çapemeniyê ya Wezîrê Karûbarê Hundir, civîna wezîran û civîna li Çankayayê. Helbet di encama van civînan da rewşa siyaseta dewletê zelaltir dê bête xuyakirin.

* * *

Komkujiya zîhniyeta cahşîtiya gundê **Zanqirtê** weke wahşîtiyeke li dijî mirovatiyê, dê were nivîsandin li rûpelên dîroka siyaseta Dewleta Tirkiyeyê. Ez bawer dikim ev ê bibe xeleka bingehîn a hilweşandina vê saziya xiyanetê ya cahşîtiyê.

* * *

Niyet çi dibe bila bibe, gera **Hasan Cemal** a Qendilê û hevpeyvîna ligel **Murat Karayilan**, ji bo xweşkirina binaxa rawestandina şer û aşbûnê qonaxeke nuh û girîng dibînim û bi xweşbînî lêdinêrim.

# Ji bo bîranîna Şêx Mahşûqê Xeznewî

**DILDARÊ AMEDÎ**

Şêx Maşûq di serhildana 12'ê Adarê ya Qamişloyê de roleke gelekî mezin lîstibû. Piştî windakirina wî li seranserê Kurdistanê û bi taybetî jî li Rojava xwepêşandanên gelek mezin hatibûn lidarxistin



Roja 10'ê gulanê bîranîna çaremîn a revandina Şêx Mahşûqê Xeznewî bû ku di sala 2005'an de ji alî hêzên ewlekariya Sûriyeyê ve hatibû revandin û di yekê hezîrana 2005'an de li paytexa Sûriye Şamê hatibû şehîdkirin.

Dr. Şêx Mahşûq zaniyarekî olî bû, mirovekî welatparêz, şoreşger û xwedî giraniyeke baldar bû di nava kurdan de. Ev yek bûbû sedem ku bibe hedefa hêzên tarî ên zilamkar ên Îstixbarata Baas a Sûriyeyê. Belê ji ber bê tehemûlkirina wan ji fikir û ramana Şêx re, kujerên dijminê mirovahiyê ew bi zikreşiya xwe kuştin. Ji ber ku Şêx ne li gorî fikir û ramana wan a şoven lê li gorî Qurana Pîroz, li gorî armanc û nirxên mirovahiyê bê tirs û xof ramana xwe dianî ziman û li cem gelê xwe yê mezlûm û bindest cih digirt. Ji ber vê yekê bû ku hêzên tarî nikaribûn van rastiyên ku Şêx her dem li ber çavan radixistin qebûl bikin.

Vê hêza hov bi kuştina Şêx hewl dan ku nirxên mirovahiyê û mafên mirovan bikujin û rûyê xwe yên tarî û nijadperest, rûyê xwe yê hovane nîşanî hemû mirovahiyê dan.

Bi vê bîranîna çaremîn a Şêxê Şehîd dema em li rewşa xwe mêze dikin em dibînin ku rewşa me ji wê demê jî hê xirabtir e û zilm û zora ku li ser gelê me dikin hê girantir bûye lê ev nayê wê wateyê ku em ê serê xwe ji dijminê mirovahiyê re bitewînin, ev nayê wê wateyê ku em ê dest ji nirxên xwe yên neteweyî berdin.

Bila hemû zordar bizanibin ku wê roj tolhildanê were, dibe ku ew wê rojê dûr dibînin lê em wê rojê pir nêz dibînin. Dema ku ew roj bê dê baş bizanibin ku wekî ew tenê şev û rojekê li ser kursiyên qiraliyeta xwe mane. Wê wê demê dê hişê wan were serê wan lê piştî ku 'hasil bighîje Mûsil' û êdî tu fêdeya poşmaniyê nemîne.

**Şêx Mahşûq kî ye?**

Dr. Şêx Mahşûq Xeznewî ji alîyê dewlata Sûrîyê ve di 10'ê gulana 2005'an de hate windakirin û cenazeyê wî di 1'ê hezîrana 2005'an de hat dîtin. Dr. Şêx Mahşûq Xeznewî di warê olî de gelek bi nav û deng bû û beşdarî gelek konferansên navneteweyî bûbû, navandek ji bo diyalogên olên/mezhebên cuda vekiribû û serokatiya wê navendê dikir. Wî di gelek komîteyên olî de cih girtibû. Berî kuştina wî ew ê beşdari konferansekê bûbûya. Di konferansên navneteweyî de pirsgirêka gelê kurd bi xurtî dianî ziman û doza piştgirîyê dikir. Şêx Maşûq di serhildana 12'ê Adarê ya Qamişloyê de roleke geleke mezin lîstibû. Piştî windakirina wî li seranserê Kurdistana Rojava xwepêşandanên gelek mezin hatibûn kirin.

**Ferheng**

| | |
|---|---|
| ***cerdevan:*** korucu | ***kujer:*** katil |
| ***hasil:*** amaç | ***zikreşî:*** çekememezlik |
| ***zaniyar:*** bilgin | ***bîranîn:*** anı |
| ***sazî:*** kurum | ***xof:*** tehdit |
| ***saxlem:*** sağlam | ***bindest:*** ezilen |
| ***rexne:*** eleştiri | ***kendal:*** yamaç, uçurum |
| ***peyam:*** mesaj | ***serbilind:*** başı dik |
| ***peyman:*** sözleşme | |

**HAWAR**
**Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti.**
Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
**Bedri ADANIR**
***Adres:***
Kooperatif Mahallesi Gevran Caddesi 1 Geçit. Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis Yenişehir - Diyarbakır
***TEL:*** 0 (412) 229 00 30
***Fax:*** 0 (412) 229 00 39

Baskı ***(ÇAP):***
***Stenbol:*** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Sefaköy - Küçükçekmece İstanbul
***Tel:*** 0 (212) 580 63 80
***Edene:*** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstîklal mah. İstîklal. Cad. ***No:*** 44 Seyhan Edene
**Yayın Türü:** Süreli

# Îranê gundekî Geverê topebaran kir

## Dewleta Îranê ku li rojhilatê Kurdistanê terora li ser kurdan bênavber didomîne piştî bombebarana bi mehan a li hemberî başûrê Kurdistanê vê carê jî gundên bi ser Geverê ji aliyê Îranê ve hatin bombebarankirin

Gundê Kokepa navçeya Gevera Colemêrgê û bajarokê Bajêrgehê ji hêla leşkerên Îranê ve hatin topebarankirin. Gundiyan ji ber topebaranê malên xwe terk kirin. Gundiyan, destnîşan kir ku êrîş bi agahiya dewletê pêk hatiye. Her wiha li gundê Xaşkana navçeya Elbakê welatiyê bi navê Savaş Ozturk ji hêla leşkerên tirk ve hate qetilkirin.

**Îranê top li gundiyan barand**

Li gorî agahiyan leşkerên Îranê duh di saetên serê sibê de dest bi topebaranê kirine. Hate zanîn di dema topebaranê de gundê Kokepê yê bi ser navçeya Geverê ku dikeve ser sînor jî îsabet girtiye û 20 guleyên topê li gund ketine.

**Guniyan herêm terikand**

Piştî Îranê gundê Kokepê ku 400 niştecihên wê hene, topebaran kir, gundiyan bi neçarî dest bi koçberiyê kir. Gundiyan ji ber ewlehiya xwe gund terikandin. Gundiyên warê xwe terikandin nêzî bajaroka Bajêrgehê li zeviyekî vala radiwestin. Li devera topebaran berdewam dike jî gelek leşkerên îran û tirk hatin sewqkirin.

**Bajêrgeh jî topebaran kir**

Piştî gundê Kokepê ji hêla leşkerên Îranê ve hate topebarankirin û gundiyan malên xwe terikandin. Bajaroka Bajêrgehê jî para xwe ji topebaranê girt. 2 topên ji hêla leşkerên Îranê ve hatin avêtin, îsabetî bajaroka Bajêrgehê kir. Ji ber topebaranê welatî bi fikar û tirs in.

**'Êrîş bi agahiya dewletê çêbûye'**

Gundiyên ku warê xwe terikandin li cihekî vala nêzî bajaroka Bajêrgehê radiwestin. Hin gundî çûne cem xizmên xwe. Di encama topebaranê de sewalên gundiyan bêxwedan mane û gelek avahî zirar dîtin û hilweşiyan. Gundiyên malên xwe terk kirin, destnîşan kirin ku her çiqas li jora gund qereqol heye jî gund hatiye topebarankirin û ev êrîş jî bi agahiya dewleta tirk pêk hatiye. Piştî bûyerê heyetek ji rayedarên leşkeran pêk dihat çû gund. Lê piştî heyetê gund cardin hate topebarankirin.

Piştî gundiyan gund terk kir, Fermendarê Alaya Geverê û leşkerên Îranê jî di nav de heyetek çûn gund û lêkolîn kirin. Di dema lêkolînê de, gund cara duyemîn hate bombebaran kirin. Di dema bombebaranê de di serî de fermandarê Alayê û rayedarên leşkerî yên Îranê demeke dirêj xwe avêtin erdê û piştre jî ji gund reviyan.

**Biryara valakirina gund hate dayîn**

Rayedarên leşkerî ku bi rev gund terk kirin, çûn cihê ku gundî lê radiwestiyan û bi wan re hevdîtin kirin. Rayedarên leşkerî îdia kirin ku bi boneya li ser sînor di navbera PJAK û hêzên Îranê de pêvçûn heye, ji ber ewlehiya can nîn e, biryara valakirina gund hatiye girtin. Rayedarên leşkeran ku demeke kurt bi gundiyan re hevdîtin kirin, piştre bêyî çareserkirina pirsgirêka gundiyên ji gund derketine, ji cem wan veqetiyan.

**Gundî: Dixwazin herêmê vala bikin**

Ji gundiyan Husret Buyuksu, diyar kir ku ligel jêra gund û jora gund qereqolên leşkerî hene jî, topebarana gund mirovan difikirîne. Buyuksu, da zanîn ku topebaran bi agahiya dewletê çêbûye. Buyuksu, wiha got: "Em bi dengê topan şiyar bûn. Piştî em şiyar bûn, me nihêrt ku parçeyên topan tên heta nava gund jî. Me agahî da leşkeriyê. Lê kes nehat. Me jî piştre zarokên xwe hildan û bi zor canê xwe xilas kir. Niha jî biryara valakirina gund derxistine. Lê rayedarên leşkerî reviyan çûn. Em li holê man. Sewalên me li gundin, deriyê me vekirî wisa reviyan."

**'Gundê me bi zanebûn tê valakirin'**

Ji gundiyan Mustafa Derînsu jî, destnîşan kir ku cara yekemîn ew rastî êrîşeke wiha hatine û zêdetirî 20 top li gund hatine barandin. Derînsu, wiha got: "Qereqolên leşkerî yên Îran û Tirkiyeyê li hemberî hev in. Lê ligel vê gundê me tê topebarankirin. Me agahî da leşkeriyê, çend saetan piştre hatin. Topebaranê carekê din dest pê kir, ew jî reviyan çûn. Armanc ew e ku herêmê bêmirov bihêlin. Îranê di destpêkê de tenê gundên li ser sînor topebaran dikir. Niha jî bi agahiya dewleta tirk gundê me tê topebarankirin. Dixwazin her du aliyên sînor bêmirov bikin. Yanî tola PJAK'ê dixwazin ji me hilînin."

**Heyeta DTP'ê çû gund**

Piştî topebaranê, heyeta yekem ku çûye gund heyeta DTP'ê bû. Heyeta DTP'ê bi gundiyan re hevdîtin kir. Serokê DTP'a navçeya Geverê Arîf Karay, bûyer wek hovîtî nirxand. Karay, destnîşan kir ku piştî gund hate valakirin, gelek kes li holê mane û anî ziman ku divê ji bo gundiyan çareyek bê dîtin.



### Li Elbakê înfaza leşkeran

Li gundê Xaşkana navçeya Elbakê welatiyê bi navê Savaş Ozturk ji hêla leşkeran ve hate qetilkirin. Hate daxuyandin ku leşkeran bi hinceta ew qaçaxvaniya mazotê dike, Ozturk rawestand û li ser vê di navbera leşker û gundiyan de nîqaş derketin. Hate daxuyandin ku leşkeran li ser vê Ozturk gulebaran kiriye û Ozturk li cihê bûyerê jiyana xwe ji dest daye. Birayê Savaş Ozturk, Veysî Ozturk anî ziman ku leşkeran birayê wî gulebaran kiriye û cenazeyê wî li nava gund hiştine. **WAN**

### Zarokê kurd înfaz kir

Li gorî agahiyan zarokê bi navê Şîrzad Melayî yê 17 salî ji gundê Waşemzîna dema li herêma Kêlê ya li ser bajarê Serdeştê diçû ji aliyê hêzên Îranê ve bi gulebaranê hat înfazkirin. Melayî, li cihê bûyerê hat kuştin. Rejîma Îranê di demên dawî de li ser sînor gelek kurd bi heman hincetê înfaz kirine. Rejîma Îranê hemû derfetên xwe ji bo xizankirina kurdan bi kar tîne û nahêle kurd bi derfetên xwe bazirganiya navxweyî bikin. Ji ber xizaniyê kurdên li ser sînor neçar in ku di nav xwe de bazirganiyê bikin. Lê dewletên dagirker destûrê nadin û bi hinceta qaçaxçîtiyê wan înfaz dikin. Roja 9'ê gulanê li herêma sînor a Şehabedîn a li ser bajarê Baneyê hêzên Îranê êrîş birin ser gundiyên Engînegulê. Di ve êrîşê de Abdullah Kerîmî hat kuştin û Yasînê ji gundê Engîna Berimergê birîndar bû. Leşkerên Îranê Yasîn kirin girtîgehê û malên wan jî di nav xwe de parve kirin.

### Zarokên kurd li Sûriyeyê jî girtîne

Polîtîkayên wehşet û girtinê yên polîsên tirk ku li hemberî zarokên kurd bi kar tîne, her diçe li welatên din ên dagirker jî esas tê girtin. Li gor agahiyên ku hatin bidestxistin li girtîgehên Sûriyeyê jî wek Tirkiyeyê ji ber Newrozê 8 zarokên kurd hatine girtin
Di agahiyên komeleyên mafên mirovan ên Sûriyeyê 'DAD' a 'MAF' ê de tê gotin ku zarokên girtî ev in; Mazlûm Ebdûlkerîm Kafî, 1991- Malkiye, Nêçîrvan Ehmed Ebdûlselam (1991)Malkiye, Ciwan Seîd Celal (1992) ji Amûdê, Malîk Şêxo Ferhan (1992) Serêkaniyê, Îsmaîl Îsmaîl Bekir (1992) ji Serêkaniyê, Şîbal Derwêş Emer (1993) ji Xirbe Timû, Rêdûr Ehmed Ebdûlselam (1993) ji Malkiyê, Egîd Ebdil Rehman Hemdoş 16 salî ji Kefer Cenê.

**Di serdagirtinan de 8 kurd girtin**

Bi fermana dozgeriya Halep û Idliba Sûriyeyê roja 7'ê gulanê bi ser 4 gundên bajarê Efrîna başûrêrojavayê Kurdistanê de girt û ligel Egîd Ebdil Rehman Hemdoş 7 kurdên din ên bi navên Ekrem Mihemed Hemdoş, Welîd Mihemed Hemdoş, Elî Elî (50), Bedir Bekir Mihemed, Hesen Îbo, Ehmed Hemdoş û Mihemed Çîçek hatin girtin.

**Kurdê bênasname girtin binçav**

Her wiha roja 24'ê nîsanê Fewaz Ehmed Hesen li Şamê bê ku tu hincet bê nîşandan hate girtin. Hesen ji ber xizaniyê ev çend sal in ku li Şamê karkeriyê dike. Hesen kurdekî bê nasname ye û nayê zanîn ka niha li ku tê girtin. Li gorî daneyên çavkaniyên herêmî tenê di meha adarê de li rojhilatê Kurdistanê hêzên Sûriyeyê 200 kurt girtine binçav. Di mehên nîsan û gulanê de ev pêla girtinê bê ku kêm bibe dom kir. Dadgehên Ewlehiya Dewletê ya Sûriyeyê cezayên giran da 36 girtiyên kurd. **QAMIŞLO / ANF**

# Têkiliya wan ji dinyayê hate birîn

Li gelek gundên navçeya Kayapinara Amedê bi boneya cîpên Jammer ên bi armanca tevlihevkirina frekansan tên bikaranîn, ragihandin qut bû. Gundiyên diyar kirin ku nikarin televîzyonê temaşe bikin, daxuyandin ku telefonên wan jî nakişînin. Gundiyan diyar kir ku pirsgirêk li gundên nêzî 16'emîn Tugaya Zirhî ya Fazil Bîlge tê jiyîn.


Ji gundiyan Musa Acar anî ev şeş mehe bi hinceta li henberm teqemeniyan ewlehiyê cîpên Jammeran hatine kirîn û Tugay 7 kîlometre dûrî gund e. Ji ber Jammeran telefon, televîzyon û tevahiya cîhazên elektronîk xirab bûne. Têkiliya wan bi cîhanê re hatiye birîn. Ev 40 sale tugay heye û pirsgirêka ewlehiyê tinebû lê ev 6 mehe ev derket. Acar xwest ku pirsgirêkê bê çareserkirin."

**'Leşkerî dibêje pirsgirêka ewlehiyê ye'**

Acar anî ziman ku ew û 10 gundên derdorê maxdur in dema nexweşek an jî karek me çêdibe ew nikarin agahiyan hildin.

**'Me nekarî gazî veterîner bikin'**

Husnu Acar jî diyar kir ku eşyayên wan ên elektronîk her tim dişewitin û wiha got: "Em her roj eşyayek xwe dibin tamîrê. Ma em guneh nînin? Telefonên me nakişînin. Demek berî çêlekek nexweş bû, me nekarî gazî veterîner bikin. 4 seat piştre şebeke hat lê hingê jî çêlek mirar bû." **AMED / DÎHA**




# Doza teqîna li Gungorenê dest pê kir

Darizandina 8 kesên ku piştî teqîna li Gungorenê pêk hat û di encamê de 17 kesan jiyana xwe ji dest da û 154 kes jî birîndar bûn, bi îdiaya kiryarên teqînê ne hatin girtin li 12'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Stenbolê dest pê kir.

Darizandina 8 bersûcên teqîna li Gungorenê yên bi navên Huseyîn Turelî, Ziya Kiraç, Abdurrahman Oral, Şerafettîn Kara, Cevat Aydin, Aydin Aglar, Mehmet Salîh Yanak, Nusret Terîş û parêzerên wan Mehmet Sanî Kizilkaya, Huseyîn Çalişçi û Ercan Kanar dest pê kir. Di îdianameya doza ku yekemîn danişîna wê pêk hat de, der heqê Huseyîn Turelî û Nusret Terîş de bi îdiaya "Yekîtiya dewletê xira kirine", "Bi qest mirov kuştine" ji bo her yekî 18 sal cezayê girtîgehê, bi îdiaya "Endamtiya rêxistina derzagonî", "bombe teqandine", "90 caran teşebûsî kuştina kesan kirine" jî ji hezar û 962 salan heta 4 hezar û 455 salan cezayê girtîgehê tê xwestin. Der heqê bersûcên din de jî bi sûcdariya "endamtiya rêxistina derzagonî" û "çêkirina bombeyan" ji 7,5 salan heta 45 salan cezayê girtîgehê tê xwestin. **STENBOL / DÎHA**

### Qeymeqam gef li muxtaran xwar

**AMED**

Qeymeqamê navçeya Karaza Amedê Kadrî Perçîn ji ber ku keyayên herêmê cerdevaniyê qebûl nekir gef li wan xwar. Qeymeqam Perçîn dawiya hefteyê ji bo cerdevaniyê bi keyayan re civîn çêkir. Di civînê de xwest ku keya cerdevaniyê qebûl bikin. Got ku heke keya cerdevaniyê qebûl bikin dê navbera wan başbe na ku neyê qebûlkirin dê berovajiyê vê be. Hin keyayê beşdarê civînê bûn li henber Perçîn bertek nîşan dan û mîka komkujiya gundê Zanqirta Şemrexê nîşan dan. Li ser vê nîqaş derket û Perçîn civînê qedand. Li navçeya Karazê hejmara cerdevanan pir kêm e û muxtaran cerdevaniyê qebûl nekir û xwesitn cerdevanî rabe.

### Rêveberê DTP'ê hate binçavkirin

**AMED**

Duh rêveberê rêxistina DTP'ê ya navçeya Yenîşehîra Amedê Huseyîn Oguzsoy ji hêla polîsan ve hate binçavkirin. Sedema binçavkirina Oguzsoy nehat zanîn. Oguzsoy li Midûriyeta Polîsan a Amedê tê girtin.

# Gelo dewlet jiberkirinên xwe ji bîr dike?

**Rayedarên dewleta tirk li ser hev peyamên cur bi cur ên ji bo pirsgirêka kurd dikin. Piştî Serokomar Gul, Serokwezîr Erdogan û Wezîrê Karên Hundir Atalay jî axivîn û peyam dan**

**NAVENDA NÛÇEYAN**

Serokomarê Tirk Abdullah Gul di meha adarê de dema diçû Tehranê gotibû 'di warê pirsgirêka kurd de dê tiştên baş çêbin'. Di nava hefteya borî de dema ji Pragê vedigeriya Tirkiyeyê heman gotin dubare kirin. Duh Gerînendeyê Giştî yê Radîkalê naveroka sohbeta xwe ya bi Erdogan re weşand. Di heman rojê de Wezîrê Karên Hundir ê Dewleta Tirk Beşîr Atalay îşaretên ji bo vegera Erdogan a ser konsepta 2005'an dan.

### Ji peyamên Gul dest pê kir

Serokomarê Dewleta Tirk Abdullah Gul beriya hilbijartinê dema diçû Tehranê di sohbeta xwe ya bi rojnamegeran re anî bû ziman ku 'dê di warê pirsgirêka kurd de tiştên baş pêk bên'. Gul piştî vegera ji Tehranê çûbû Bexdayê jî û dîsa di balafirê de peyva 'Kurdistanê bi kar anî bû'. Ji ber bertekên çûbûn, piştî vegeriya Enqereyê gotina xwe înkar kirin.

Gul herî dawî hefteya borî dema ji Pragê vedigeriya got: "Divê di warê pirsgirêka kurd de tiştên baş pêk bên. Jidestdayîna vê pêvajoyê baş nabe."

### Hişê Erdogan tevlihev e

Piştî van gotinan Serokwezîrê Dewleta Tirk Recep Tayyîp Erdogan li Stenbolê bi Gerînendeyê Giştî yê Rojnameya Radîkalê Îsmet Berkan û qunciknûsê wê Akîf Bekî re sohbeteke berfireh pêk anî. Îsmet Berkan sohbeta bi Erdogan re kiriye duh weşand. Û ev hişyarî kir: Ji ber ku em bi awayekî hevpeyvînê neaxivîn hevokên ku ez ê saz bikim aydê min in.

Li gorî agahiyên ku Berkan ragihandine, Erdogan bi berfirehî li ser hevpeyvîna Hasan Cemal a bi Serokê Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê Murat Karayilan re rawestiyaye. Der barê mijarê de Berkan wiha nivîsiye: "Min hîs kir ku Serokwezîr ji bo pirgirêka kurd bi îhtiyad e lê xweşbîn e. Hevpeyvîna Hasan Cemal a bi rêveberî sereke yê PKK'ê Murat Karayilan re kiriye bi baldarî xwendiye. Lê encameke tekûz jê dernexistiye. Ji ber ku li ser gelek parametreyan hûr dibe... Baweriya min ew e ku dê Hasan Cemal vexwîne û rû bi rû nêrînên wî guhdarî bike."

Berkan di dewama nivîsa xwe de aniye ziman ku çavlirêye hikûmet hin gavên sembolîk bavêje. Navên wargehên kurdan ên hatine guhertin dê bêne sererastkirin. Di weşanên televîzyonên herêmî de sînorkirinên ji bo weşana kurdî di ber çavan de bêne derbaskirin. Her wiha beşên kurdî yên di zanîngehan de bêne vekirin jî hene. Di vî warî de lezgîniyek çêbibe divê mirov şaş nebe.

### Gotinên Çîçek tên çi wateyê?

Ji nivîsa Berkan duxuyê ku aciziya Erdogan a ji DTP'ê hê jî bi dawî nebûye. Mînak, Erdogan li hemberî lêxwedîderketina DTP'ê ya ji bo rayedarên ku di çarçoveya operasyona 14'ê nîsanê de hatibûn girtin, aciz e. Berkan radigihîne ku Erdogan ligel vê aciziya xwe îhtîmal heye ku helwesta xwe ya li hemberî DTP'ê biguherîne. Lê balkêş e ku di Erdogan li ser helwesta Berdevkê Hikûmetê Cemîl Çîçek a ku DTP'ê wekî hêzeke neyar nîşan dide tiştek negotiye. Ligel ku li hemberî neyartiya Çîçek a ji bo DTP'ê û gelê kurd, Erdogan di vî warî de tiştek negotiye. Gotibe jî Berkan ranegihandiye. Ji ber ku Erdogan gotineke ji Çîçek cudatir nabêje siyaseta kurd gotinên Cemîl Çîçek ên bi sîfetê berkevkiya hikûmetê gotine wekî helwesta nêrîna esasî ya hikûmetê qebûl dike.

### Atalay daxuyanî da

Wezîrê Karên Hurdir ê Dewleta Tirk Beşîr Atalay jî duh derket pêşberî rojnamegeran û îşaretên dema nû dan. Li gorî agahiyên Atalay dayîn, dewlet mûşteşariyeke nû ava dike û ev bêyî ku yekser nav bike ev mûşteşarî dê li ser pirsgirêka kurd bixebite. Çarçoveya Atalay a ji bo mûşteşariyê destnîşan kiriye ji 'ewlehiyê' heta îstîxbaratê û kar û barên akademîk, dê têkildariyeke xurt pêk bîne. Atalay di anî ziman ku 'ew ê vegerin ser konsepta axaftina Erdogan a di 12'ê tebaxa 2005'an li Amedê kiriye'. Atalay wiha got: "Em wekî hikûmet aşkera dibêjim, peywîrdariya mûşteşariya nû tê avakirin, em ê pişt gotinên serokwezîrê me ku di tebaxa 2005'an de li Amedê kiribûn rawestin." Navê mûşteşariya ku dê bê avakirin jî wekî 'Mûşteşariya Rêkûpêkkirina Cemawerî û Ewlehiyê' hate lêvkirin. Fermandariya Giştî ya Cendirmeyan jî dê girêdayî vê mûşteşariyê be.

# Ji bo Makeqanûnê konsensûseke yekgirtî divê


Yalçin Karayagiz

Akademîsyenên ku xwestin Makeqanûn ji bingeh û bi awayekî radîkal bê guhertin, diyar kirin ku divê di amadekariya Makeqanûnê de hemû beşên civakê xwedî mafê axaftinê bin. Akademîsyenan, destnîşan kirin ku lazim e amadekariya Makeqanûnê tenê ji aliyê siyasetê ve pêk neyê û xwestin Makeqanûna nû bi lihevkirina civakî pêk bê.

Ji akademîsyenên Zanîngeha Yildiz Teknîk Alîkarê Doç. Dr. Mehmet Ozan Erozden, destnîşan kir ku ji sala 1982'yan û vir ve daxwaza ji bo guhertina Makeqanûnê her tim tê rojevê û anî ziman ku guhertinên heta roja îro pêk hatine tu pirsgirêk çareser nekirine. Erozden, wiha dom kir: "Makeqanûnên demokratîk çewa derdikevin holê. Di nava pêvajoyek mirov bikaribe riya navîn bibîne de dê pêşketinek demokratîk pêk bê." Erozden, daxuyand ku divê Makeqanûn daxwazên hemû beşê civakê pêşwazî bike. Eroden, da zanîn dema kurd xwe di makeqanûnê de bibînin dê daxwaziya cudakariyê nekin.

### Nîqaşa ji bo welatîbûnê

Erozden, derbirî ku miheqeq divê girseyên di nava sînorê dewletê de cih digirin bên tarîf kirin. Erozden, têkildarî zimanên etnîkî di makeqanûnê de cih bigirin jî wiha got: "Pêwîste di gotina welatîbûnê de jî hin guhertin bên pêkanîn. Divê di Makeqanûna nû de peyva netew bi temamî li ser esasê welatîbûna hiqûqî bê tarîfkirin."

### 'Divê lihevkirin çêbibe'

Prof. Dr. Yalçin Karayagiz jî, diyar kir ku divê Makeqanûn ji bingeh û bi şiklekî esasî bê guhertin û anî ziman ku dê ev guhertin encama aqilê siyasî, çandî û zanistî be. Ne mimkûne mirov vê yekê ji bo welat qebûl bike. Karayagiz, bal kişand ku tenê bi gotina parlamenteran Makeqanûn nikare bê guhertin û wiha derbirî: "Makeqanûn metnên lihevkirina civakî ne. Ji ber vê yekê tu kes nikare bêyî agahiya civakê pêk bîne. Divê hemû beşên civakê tevî amadekariyên Makeqanûnê bibin. "

### Pêkhatina konsensûsê

Ji akademîsyenên Zanîngeha Marmarayê Prof, Dr. Nîhal Saban jî ku diyar kir ji hêla siyasetê ve di mijara amadekirina Makeqanûna nû de divê rayagiştî bi awayekî rast bê agahdarkirin, bi lêv kir ku AKP vê yekê pêk nayne û anî ziman ku dê guhertin li gorî çi pêk bê ev girîng e. Saban, derbirî ku divê di bijara pirsgirêk civakê de lihevkirinek konsensusek pêk bê. **STENBOL / DÎHA**


Mehmet Ozan Erozden

## Artêşa Srî Lankayê sivîl qetil kirin

**KOLOMBO**

Artêşa Srî Lankayê li welatê Tamîlan Mullaiththeevuyê qetlîam pêk anî. Peywîrdarên tenduristiyê ragihand ku wan li 'herêma ewlehiyê' zêdetirî hezar û 200 cesedên sivîlan hejmartine. Artêşa Srî Lankayê roja şemiyê bi balafiran êrîş birûbû ser herêmê. Hate hînbûn ku di encama êrîşa hewayî de Berdevkê Leşkerî yê Pilingên Tamîlan jî birîndar bû ye. Serokê KONGRA GEL Zubeyîr Aydar qetlîama Srî Lankayê ya li hemberî gelê tamîl şermezar kir û piştgiriya xwe ya ji bo têkoşîna azadiyê ya gelê tamîl anî ziman. Aydar bangewaziya agirbesteke dualî kir û bêdengiya raya giştî ya navneteweyî ya li hemberî vê qetlîamê jî rexnekir.

## Li Bedlîsê greva birçîbûnê bi dawî bû

**BEDLÎS**

Li Bedlîsê, çalakiya greva birçîbûnê ya 2 rojî ku ji bo şermezarkirina operasyona li dijî DTP'ê pêk hatibû, bi daxuyaniya çapemeniyê ya bi girseyî dawî bû. Endamên PM'ê ya DTP'ê Abdulkerîm Bîngol, Kazım Kurt, şaredar û endamên Meclîsa Şaredariyê û Meclisa Bajêr a Giştî yên DTP'ê jî di nav de nêzî 500 kes li ber Mizgefta Mezin civiyan. Li ser navê girseyê Serokê DTP'a Bajarê Bedlîsê Husamettîn Zenderlîoglu, daxuyaniyê da û diyar kir ku ew dê li hemberî pêkutiyan serê xwe daneyinin. Zenderlîoglu, da zanîn ku li Bidlîsê jî di nava wan de rêveber jî hene 50 endamên DTP'ê hatine binçavkirin û girtin. Zenderlîoglu, destnîşan kir ku binçavkirin û girtin bûye perçeyek ji jiyana wan a xwezayî. Zenderlîoglu, anî ziman ku ew wek kurd ne ji binçavkirinan û ne jî girtinan ditirsin. Zenderlîoglu, ev tişt gotin: "Yên ji bi pêkutiyan wê me ji têkoşîna me veqetîne, hêvî dikin xwe dixapînin."

## Li Qersê greva birçîbûnê dest pê kir

**QERS**

DTP'a Qersê ji bo şermezarkirina operasyona li dijî DTP'ê bi daxuyaniya çapemeniyê ya bi girseyî çalakiya greva birçîbûnê ya 2 rojan da destpêkirin. Rêveberên rêxistinên DTP'ê yên navend û navçeyan, şaredarên navçeyan, endamên meclîsa bajêr a giştî û meclisên şaredariyan jî di nav de bi sedan kes beşdarê daxuyaniyê bûn. Daxuyaniya ji hêla Rawestgeha Dîgorê hate dayîn ji hêla Serokê DTP'a Bajarê Qersê Velî Mukyen ve hate xwendin. Mukyen, diyar kir ku operasyona li dijî partiya wan bêtehamuliya li dijî îradeya gel a di 29'ê adarê de danî holê, ye. Grev îro bi dawî dibe.

# Nûnerên partiyên siyasî: Riya çareseriyê diyalog e

Piştî daxuyaniya Serokomar Abdullah Gul a wekî, "Pirsgirêka bingehîn a Tirkiyeyê pirsgirêka kurd e. Divê teqez bê çareserkirin" nûnerên partiyên siyasî bi bîrxistin ku berî niha jî daxuyaniyên wiha dayîne lê tu gavên somut nehatine avêtin. Nûnerên partiyan derbirîn ku lazim e ji bo çareseriya pirsgirêka kurd diyalog dest pê bike.

**Cîgirê Serokê Giştî yê ODP'ê Alper Taş:** Daxuyaniyên ji bo rayagiştî hatine gotin rastiya xwe winda kirine. Pirsgirêka kurd êdî bi rêbazên tê zanîn, çareser nabe. Lazim e gavên ber bi çav bên avêtin. Serokê Konseya Rêveber a KCK'ê Murat Karayilan di roportaja bi Hasan Cemal de bi zelalî çareseriya pirsgirêkê daniye holê. Berî niha jî gotinên Gul ên wiha çêbûn. Lê pêşketinek ber bi çav çênebû. Kurdan di hilbijartinên herêmî de helwesta xwe danîn holê û daxwazên xwe zelal kirin.

**Endamê MYK'a SDP'ê Yaman Yildiz:** Di Newroza 2009'an de kurdan wekî muxatab Abdullah Ocalan nîşan da. Cardin ji bo riya diyalogê vebe gel DTP wekî navnîşan nîşan da. DTP'ê, Qendîlê û Ocalan wekî muxatab nîşan dide. Ev nebin komîsoyna mirovên aqlane dibe. Ev zemîna diyalogê ne. Lê rewşenbîrên tirk niha dibêjin lazim e pêşiyê PKK çekan berde. Ev nêrîn xelet e. PKK'ê di salên 1999-2004'an de derkev derveyî sînoran. Lê hêzên demokrasiyê û dewletê ev pêvajo heba kirin. Lazim e berî her tiştî operasyon rawestin.

**Serokê EHP'ê Hakan Ozturk:** Li Tirkiyê hebûna pirsgirêka kurdan hatiye qebulkirin, lazim e li pirsgirêkê cidî bê nêrîn. Ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd lazimê sekneka ji bo çareseriyê bê nîşandan. Ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd lazime dawî li pêkutiyên li ser DTP'ê werin û lazime operasyonên li ser tevgera kurdan bên bi dawî kirin. Em wiha tevnegerin em ê rastiyên girîng ji destên xwe berdin.

**Berdevkê Teşebusa 78'an Celalettîn Can:** Bi hişmendiya ku çareserî bêjî wê bi lewazkirinan tevgera kurdan were çêkin hebû. Ji ber wê jî operasyona li hemberî DTP'ê pêk hat. Xwestin destê DTP'ê lewaz bikin. Gelek pirsgirêk li benda çareseriyêne. Serê AKP'ê û yê leşkeran tevlîhev e. Li hember çareseriyê lazime vekirîbin û ji bo çareseriye daxwazên bi hêz lazim in. **STENBOL**

# Piştî hilbijartinê bazara avê betal bû

Boruyên ku ji bo şebekeya avê berî hilbijartina herêmî birine gundê Şabugana bi ser Exîla Amedê, bi hinceta AKP ji sindoqê derneketiye paşve hatin girtin. Gundiyan ku ji ber boriyên di çarçoveya projeya BELDES'ê de hatibûn dayîn û piştî hilbijartinan dîsa ji gund hatin derxistin nerazîbûn nîşan da û pirsa; "Ma ji bo şebekeya avê çêbikin divê em dengê xwe bidin wan?" kirin.

Di dema hilbijartinê de ev lîstik li Dêrsim, Amed, Êlih û gelek bajarên din ên herêmê hate lîstin. Aktorên lîstika li Exîla Amedê hate lîstin jî, Namzetê Şaredariya AKP'ê, Serokê AKP'a Bajêr û amîrên mulkî bûn. Di navbera gundiyên Sabuganê û Namzetê Şaredariyê Ruhî Karakaşê AKP'î, Serokê AKP'a Amedê Ahmet Ocal de berî hilbijartina herêmî bi 20 rojan, li beramberî di hilbijartinê de dengên xwe bidin AKP'ê bazara raxistina şebekeya avê hate destpêkirin. Gundiyên ku bi keran ji Mezraya Bozva ya 2 kîlometreyan dûrî gundê xwe avê bînin, ji bo şebekeya avê berî hilbijartinan bê kişandin israr kirin, lê AKP'iyan jî got 'bila bimîne piştî hilbijartinê." Gundiyan, da zanîn eger berî hilbijartinan avê bikişînin gund dê dengê xwe bidin AKP'ê, lê AKP'iyan "soza" dê piştî hilbijartinê avê bînin dabûn.

### Dîsa avê dikişînin

Li ser israra gundiyan Qaymeqamê Navçeyê Menduh Tura, ji 135 hezar TL'yên ji bo BELDES'ê hatibû cudakirin bi 17 hezar TL'yan 250 boriyên korega kirîn û rêkirin gund. Lê ji ber berî hilbijartinê av nehate gund gundiyan li şûna AKP'ê dengê xwe dan DTP'ê. Dema di hilbijartina herêmî de Namzeta Şaredariyê Petek Çapanoglu ya DTP'î qezenc kir, rewş guherî. Boriyên ku berî hilbijartinan anîbûn gund, bêyî tu hincet bê nîşandan ji aliyê rayedaran ve dîsa ji gund hatin derxistin. Gundiyên ku "Bazara avê" winda kirin, dîsa bi keran ji Mezraya Bozva ya 2 kîlometreyan dûr avê dikişînin. Gundî niha jî hêvî dikin ku Şaredara nû Petek Çobanoglu avê bikişîne gundê wan. **AMED**

# Şaredariya Misircê bi karkeran re TÎS îmze kir

Merasîma îmzekirina TÎS'ê li Salona Şaredariya Misircê pêk hat. Şaredarê Misircê Necat Yilmaz, Serokê Şaxa Tum Bel-Sen'ê ya Sêrtê Ferît Ozdemîr û endamên sendîkayê tevli merasîmê bûn.

Li salonê pankartên "Bêsendîqa demokrasî, bêpeymana tomarî sendîka nabe" hate daliqandin. Di merasîma îmzeyê de Şaredar Yılmaz, axaftinek kir û wiha got: "Dema em hatin ser kar me soz dabû karker û karmendên xwe, me sozek dabû ku wê serokê sendîkayan nekevin navbera min û karker û karmendên min. Bila ev wiha neyê fêm kirin. Ne jî bo ku em ji serokên sendîkayan hêrs dibin, ji bo em û ew jî nerehet nebin, em ê nirxên ku karmend û karker heq dikin bidin wan." Serokê Şaxa Tum Bel-Sena Sêrtê Ferît Ozdemîr, ji ber keda Şaredar Yilmaz, spasiyên xwe kirin. **SÊRT**

www.arsivakurdi.org

# Oryantalîzma herêmî û niştecihî



**Cîhan Roj**

Dil li min sar e, dest li min sar in. Dixwazim biqîrîm da her kes tifû şanaziya eşîrtî bike lê bi qîrînî nabe. Xwezî dibêjim dengê min jî biherikiya nav hawara zarokekî ev xwezî hinekî hêvî dide min.

Pirsek herî asan, wexta însan ji diya xwe dibin bi çi ferqî tên dinyayê? Hîç! Belê, ger dayik dayikeke modern be û xwedî derfet be wê ji her tiştî bixwe û vexwe; bi wî awayî wê dergûşek saxlem bîne. Dîsa derûniya wê baş be, ne bi halê travmatîk be dîsa ji aliyê ruh ve wê dergûşa wê xwedî ruhekî xweş be.

Baş e,wexta em kurd ji diya xwe de dibin ji derî van derfetan çi kêmaniyên me hene? Ez dizanim ev ne gotin in lê pirî şîrove dibin sedem ku însan van pirsan bike. Pirî şîrove bi awayek mîna me qanih bikin ku, ev qederek e! Çi bê kirin jî wê rewş wanî be! Ev xalek girîng e.

Bi tevî gelek sedeman wekî xala navendî gerek em Oryantalîzma di dilê oryantalîzmekê de bigengêş in. Eger em li edebiyat, huner û sînemaya vî welatî binihêrin û polîtîkayan hinekî tehlîl bikin em ê wê oryantalîzma herêmî bibînin.

Rastiyên me jî hene û em ê nikaribin wan veşêrin. Ji veşartinê bêtir bi awayek tund gerek werin deşîfrekirin. Gerek were bibîrxistin ku êdî însan tifû şanaziya eşîrtiyê bikin. Însan karibin naletê li tevger û adetên feodalî bînin.

Ji bo ew halê oryantalîst û rastiyên wê bêne deşîfrekirin jî beriya her tiştî saziyên ne modern, ên ku her wext ruh û şexsiyeta kevnare, teng temsîl dikin bêne deşîfrekirin. Em gerek bi bîra hev bixin ku ew ne rûmet in her wext rûreşî ne. Lewre di nav wan saziyan de takekes girtî ye, dîl e. Di wan saziyan de jin bi êş e. Ma ev tesaduf e ku wexta serekê eşîrekî dibe cerdevan hemû eşîr pev re dibin cerdevan.

Piştî bûyera li Zankirtê xuya ye ku wê nivîskarên kurd jî gelek tiştan bigengêşin. Bi derengî be jî baş e. Ez ê derpêş bikim ku nivîskar û rewşenbîrên kurd bi awayek di bin bandora manîpûlasyon û nêrînên oryantalîst de dimînin ku wekî me got oryantalîzma parzemînî û ya herêmî. Ger dûrbûna ji jiyanê û însanan mijar be gerek pariya vî rastiyê jî neyê ji bîrkirin.

Bûyera li Zankirtê gerek bibe sedem da em, li ser vê erdnîgariyê, têkiliyên kulturî, edebî, hunerî, têgihiştinan, nêziktêdayînan bi awayekî kûr û berfireh bigengêşin. Her car wê têgehên wekî oryantalîzm, nêrînên oryantalîst xwe bidin der.

Hemû xebatên ji bo nasîna Rojhilat ên ji aliyê Rojavayiyan ve hatine kirin wekî oryantalîzm tê binavkirin. Bi kurtî, wekî nêrîn û fikrên Rojavayiyan ên der barê Rojhilatiyan de tê derbirîn.

Nêrînên Rojavayiyan ên oryantalîst li vê erdnîgariyê çawa teşe wergirtiye? Em ê bi dû bersiva vê pirsê nekevin. Ev tenê bîrxistinek e. Lewre bersiva vê pirsê heta niha ji aliyê sedan kesan ve hatiye dayîn. Ger jiyana modern esas bê girtin, hêjayî gotinê ye ku ew nêrînên Rojavayî bi piranî bûne astengî; rê li ber pêşdeçûna Rojhilat venekiriye. Ev îronî ye.

Rojava wekî alternatîf, "em ê li filan cihî wekheviyekê bi dest bixin" negotiye, nabêje. Bi nêrînên oryantalîst re mîna bêje, "bişibe min, bikeve halekî wisa da ez te begem bikim" Ger demokrasî armanc be, ev nakokî ye, ev xwesteka yekserîtiyê ye(tekleştîrme), ev rê dide ku halê, "ên din" xwe bide der. Demokrasî di heman demê de derbirîna alternatîfan e. Ger hûn bêjin, bişibe min, tu ne çu tiştî, tu belengazî, di heman demê de hûn dibin sedem da ên din xwe li serhişkiyê bigirin, xwe di nav xelekê de bigirin, xwe li guherînê negirin. Xwesteka, bi tevahî xwe li min bigire, ez ji bo te referans im, dikeve halê peyamek wanî ku di heman demê de hûn ji yên din re dibêjin, çu taybetiya te tune, tu nikarî biafirînî, ancax bi mohra min tu dikarî nav li xwe bikî. Bi awayek hûn tenê texlîdê wekî çareserî pêşkêş dikin ev jî rê dide problemên bingehîn.

Gelo Rojavayî nizanin an ne haydar in? Helbet dizanin lê mesele kûr e. Em pê dizanin ku di pergala wan a perwerdehiyê de armanca mezin ew e ku da hûn bibin alîkar ku zarokan bi ser piyan bixin, piştî we bi ser piyan xist gerek êdî hûn dev jê berdin da zarok karibe bi awayek azad bijî. Gelo ji bo çi di nêziktêdayînên bi gelan re armancek wanî xwe nade der, rastî hinekî jî wiha ye.

Her wext Rojavayî bi halekî keşifkar bûn, xwe li keşfê digirtin. Êdî keşf ne tiştek luks e. Di wateya kulturî de jî tu raza keşifkirinê nemaye. Di dewsa keşfê de gerek deşîfrekirin esas be. Dîsa, halê mexdûran, wijdan, jiyana modern wekî xemên mezin bêne dîtin. Takekesek an jî jiyanek li cihek dinyayê ji me ne gelekî dûr e êdî.

Baş e, Rojhilat di nav xwe de bi çi têkiliyan dijîn? Bi kurtî oryantalîzmek herêmî an jî niştecihî heye? Belê em dikarin behsa rewşek wanî bikin. Me bûyera li Zankirtê bi bîr anî. Wê çaxê em ê rewşa li vî welatî bi bîr bînin. Li vî welatî bi gelemperî hişmendiyek çawa heye? Bi çi awayî û çavî li edebiyat, huner û kultura kurdan tê nihêrîn? Bi yekcarî em ê bêjin nêrîn û fikrên oryantalîst xwe didin der! Her ku bi awayê zanîstî xebat nehatibin kirin jî ango oryantalîzmek bi vî awayî li meydanê tunebe jî nêrîn û fikir oryantalîst in.

Halê egzotîk û fantastîk ê Rojhilat bala Rojavayiyan vekişandî ye bi wî awayî folklor û hin adetên kevnare ên dramatîk li vî welatî bala derdorên edebî û hunerî vekişandiye. Belê bal kişandiye lê nêrîn oryantalîst in. Ev eleqe mîna ne ji bo çareseriyê be, ew hal û adetên wekî berdêlî, tore… her wext mîna 'melzeme'hatiye dîtin! Û hûn hîs dikin ku tirs bi kesan re heye ku 'ew çavkanî', 'ew melzeme' bi dawî bibe! Lewre jî problemên mantelîteyî, problemên edebî, kulturî bi sayakî têne gengêşîn. Di çareseriyan de dîsa bi awayekî tê xwestin ku her kes, bişibe wan!

Di fikrên oryantalîst de cihê manîpulasyonê jî muhîm e. Pirî caran jî bi navê dîsîplînên zanîstê halekî sayakî tê pêşkêşkirin. Dîsa em wehşeta li Zankirtê bi bîr bînin; tê gotin ku perwerdebûna keç û jinan muhîm e. Ev rast e. Lê nayê gotin ku bi kîjan zimanî! Gelek kes jî bi awayek wanî dibêjin ku da kurd bi awayek derûnî nalet li xwe bînin! Mîna bêjin, binihêrin hûn xwe li asîmîlasyonê nagirin, binihêrin hûn di çi halî de ne û çi tê serê we!

Mesela nayê gotin ku însan bi çi awayî ji jiyana feodal û gundîtî derbasî jiyana bajarî dibin. Di dewsa van rastiyan de mîna henekên xwe bikin hin jê dibêjin ku ger filankesî ku di navçêtiyan de biserketiye navçêtî bikira û biba qasid wê ew tişt neqewimiyana. Helbet navçêtî û hewlên lihevanînê hewlên însanî ne lê çareserî ne ew e.

Ger em têkiliya edebiyatê û jiyanê bifikirin ev hal xwe di edebiyatê de jî dide der. Nêrînên oryantalîst ên Rojavayî û ên herêmî û niştecihî bandor li edebiyatê jî dikin. Pirî caran hin wêjevanên tirk dixwazin rê li ber wêjevanên kurd bixin: "Edebiyata tirk ji bo xwe bikin referans." Helbet ev bi niyetek baş tê gotin. Lê di rastiyê de hewlên, birayê mezin, nêziktêdayînên oryantalîst tê de veşarî ne. Ji bo çi nabêjin, em hemû derfetên wêjeyê bigengêşin, wêjeya dinyayê mîrate ye ji bo hemû edebiyatan. Na, helbet mebesta wan edebiyata nivîskî ya kurd e. Di nêziktêdayîn û şîroveyan de hûn bêtir reng û dengên oryantal dibînin û dibihîzin. Dîsa hûn dibînin ku ew 'melzeme'ji bo wan muhîm e, û her wext wexta mijar edebiyat û kultura kurd be heman têgeh û heman tişt bi bîra wan tê; tore… Carinan însan dixwaze di gotar û nivîsên wan de risteyên helbestî ên bi kurdî bibîne, însan dixwaze bibîne ku ew jî ji edebiyata kurdî tehm û çêj werdigirin.

Cegerxwîn ji bo edebiyata me deryayek e. Wekî xwendevanekî kurd ez jî ji hinekî helbestên wî hez nakim û hêza hunerî tê de nabînim. Lê di heman demê de em dizanin berhemên wî yên wanî hene ku di asta hunerî û edebî de însan dikare bi rojan şîrove bike. Hûn rabin di antolojiyan de hew çend helbestên wî mînak bidin û bixwazin bêjin, binihêrin Cegerxwîn di heman demê de ev e, bivê nevê mantalîteyek, hewlek oryantalîst xwe dide der. Wê kes rastiyan bi bîra we bixin û bêjin, gelek navdar hene ku berhemên ne baş lêkirine lê mirovahî wan berhemên wan ên ne baş bi bîr nayne, bi hurmet berhemên wan ên serkeftî bi bîr tîne.

Helbet karê edebiyatê rexne ye, nîşandayîn e, bîrxistin e lê îtîraza me ji bo çareseriyên wê mantelîteyê ne. Di pirtûka xwe ya bi navê 'Mutluluk (bextewarî)'de Zulfu Lîvanelî du mexdûrên 'tore'yê wekî çareserî spartibû akademîsyenekî. Ne giş bin jî îro em dizanin pirî akademîsyen nûnerê burokrasiyê ne. Ev jî ji derî nêrînên oryantalîst 'çareseriyek' din e!

Em dixwazin rexne li mantelîteyê bigirin, li nêrînên oryantalîst bigirin. Helbet êdî ev rewş jî tê guhartin. Halên têgihiştinê jî hene û gelek kes bi hewlên hêja bi dû têgihiştinê ketine.

Gelo nêrînên oryantalîst çi bandor li nivîskariya kurd kiriye, dike. Ev jî xalek muhîm e. Hat/tê dîtin ku hin wêjevanên kurd jî ji bo xwe bidin begemkirin gelek têkoşiyan. Têdikoşin.

Ez dixwazim we texlîd bikim, ez dixwazim mîna we bim, tiştek e, asta ku hûn gihiştinê ji bo min jî hedef e, tiştek din e. A rast gerek însan karibe bêje, tiştên li cem min jî hene, ez dixwazim wan tiştan tevlî mîrateya dinyayê bikim.

Dîsa rastiyên jiyanê pirî caran rê didin ku nivîskarên kurd demoralîze bibin. Balkêş e piştî bûyera li Zankirtê nivîskarekî kurd rabû ji belgeyên dîrokî halê jiyana kurd ên wan çaxan bi bîra xwendevanan xist! Em ê çawa şîrove bikin? Helbet bi awayek ev tê vê wateyê ku nivîskar mîna bêje, em her wext wanîbûne! Ji xwe di nêrînên oryantal de hinekî ev hal heye; tê gotin ku zor e tu biguherî, halê te wanî ye, lê hin hal û rewşên te jî bala min dikişînin!

Em dikarin bêjin ku mesele di bingeha xwe de, bi nêziktêdayîna li demokrasiyê re têkildar e. Rojava îhtimal nade ku Rojhilat zû bi zû xwe li demokrasiyê bigire. Bêhêvî maye. Li vî welatî jî wanî ye; hişmendiyek heye ku îhtimal nadin da kurd jiyanek demokratîk hezim bikin. Xwe li jiyanek demokratîk bigirin.

Bêhêvîtiya Rojava bûye sedem ku ew xwe li azînên din bigirin. Rojava bi dû ketî ye, modelan ava bike. Di warê huner û edebî de jî wanî ye. Belê ev rê ye lê ne çareseriyek bingehîn e. Bêtir Rojava (belkî bi gelemperî gotina Rojava, Rojhilat bi xelet be lewre gelek nêrîn tên gengêşîn û gelek nêrîn diguherin), an jî, ew mantalîte, dibêje, binihêre, tu jî dizanî zor û zehmet e da tu biguherî wê çaxê bişibe min, xwe li texlîdê bigire. Bi vî awayî însan nikare jiyanek û nêziktêdayînek modern bi dest bixe an jî bi cih bike. Hurmeta ji bo yên din, têkiliyên demokratîk bê yên din re bêtir bi bandor e û durist e. Ji nêrînên oryantalîst bêtir nêziktêdayînên nû pêwîst in. Ew jî ev e ku guherîn û veguherîna hemû civakan bibe xem. Bi awayek êdî kes nikare bêje, çi min jê! Jiyan û însan ew qas ji me ne dûr in… Êşên 'ên din' êdî nahêlin hûn jî zêde bextiyar bin. Ne ji bo 'wan'(!) be jî, ji bo we be jî hûn neçarên gelek nêziktêdayînan biguherînin!

## Qerf û Henek

### Nameya Generalî, qabê Şêx Zubêrî esto

Rojnameya ROJEV de, rojanê şî Şêx Zubêrê Kurdî nuşteyê nuştbi. Ney nuşte di-de, ey, mi dayo dasî-dahrê xo vero. Feqet camêrd nêewnîyeno xo û aqil roşeno mi. Ez bi kurdî qalî keni û wanen, heta ray rayan zî nuşneni. Beno ke ez bi tirkî zî qalan bikerî, ema!!! kesê ze ey, eg reseyo maqamê de berz û ronişto, nêşeno qalanê bi tirkî bikero?

Şima dê vajê çira? Qey maqamê ey zaf berz o? Hetê min zaf berz nîyo. Feqet, Şêx Zubêrê Kurdî xo ze kurdolog vîneno û şino çi ca hureynîya kurdî de, beno warwara ey û bi tirkî qalan keno. Feqet ez heqê ey mewrî û ez raştey vajî, gora cayan zî, ray bi rayan zî bi kurdî qalan keno.

Ez nûmûneyê bidî; birêz Camêrê Kurdolog (!) rojnameya GUNLUK di-de ziwanê kurdi sero bi tirkî nuşneno, mo no qabê ey şerm nîyo qurba! Gere merdimî eyra vajê ÊDÎ BES O, ŞÊX ZUBERÊ KURDÎ. Ney ra aşt, bi turkî menuşni. Eg ti şarî rêxne kenê sifte xo rixne bikê. Apey mi û şarê bînan rixne bik. Kiştê ra zî ez vani normal o, tu kes boya ke eyra yeno nêgeno û nêvîneno. Hela Şêx, qet nêgeno û nêvîneno.

Yanê, Şêx, qet nêşino neynikî vero û nêewnîyeno xo ke, xo neynikî de bivîno. Nêşino neynikî vero û vano ez rinda, neynik mira îcap nêkeno. Ya zî, nêewteno şêro biewno neynikî û qebehetanê xo biewno! Çîyê ke Şêxê ma zano, kesan dano das û şimşêra xo vero, no çî şerm o şerm...! Ez çîyê nêwajeni, çiyê ke ez wazeni wa Şêx tikey bo zî bifikiryo û kêmaseyanê xo zî rojnameya ROJEV de binuşno. Eg menuşno ez o vajî, o, xo kurdan mîyan de, ze qûmaşê hîntî vîneno. Şêxo, ez keni to vîr ke, ez û ti ma generalê qijkekan ra yê. Ma ney vîra nêkê ke, ma yew cayî ra ameyê. Ney welatî de generalî ze dîkan kenê qî qî û veng danê şarî... Ney ra, eg ti nêwazenê kilawa to û şaşika to, to serera bêro girotiş, kerema xora vengê xo nêvej û qula xo de bivindi û bela xo mesawi mi?! Heyra ez vani, de ti zanê? ***Generaleke Apê Mûsa***

## HAWARA EYŞO

WAZÊN MELE




HACÛNÊN NÛDEM






**Prof.Mihê Dîn**

## Çîrokeke cerdevanan

Gelî ezbeniyan!

Zêde dûr û dirêj nakim...

Sixk û pîvazan tevlî hev nakim...

We ji xwe bêzar nakim...

Hema kurt û kurmancî ez ê gotina xwe bêjim...

Li ser cerdevaniyê –ji bo ku kelamê nivîsê gemarî nebe nabêjim cehşîtî- çîroka herî zêde çûye li xweşa min ez ê bi we re parve bikim...

Şevekê ji şevên payîzê mirovek li mala xizmên xwe dibe mêvan.

Heta direngî şevê li ser meseleyên dinyadariyê sohbetê tê kirin.

Piştî şîvê, paşîv jî tê xwarin sohbet bi dawî nabe...

Di kêliya dawî de mêvanê malê radibe û dibêje ez ê biçim maleke din rakevim.

Xwediyên malê cihetiya wî dikin û dixwazin ku neçe...

Çiqas didin zorê, mêvan ji ya xwe nayê xwarê û dibêje; 'ez ê biçim li mala 'Eliyê Beytê' rakevim'.

Di vê navberê de yek ji nebalixên –zarok- malê ji dilsafiya xwe dipirse ku çima mêvan li mala wan ranazê.

Mêvan yekser got: 'Li mala we cehş hene, ji ber hindê li mala we ranazêm'.

Nebalixî nekir nemerdî û got: 'Wele li mala me yek heye, lê li mala tu diçiyê du cehş hene.

Hema were razê û dengê xwe neke.'

Di van rojên ku tim qala cerdevanan tê kirin de ev çîrok hate bîra min.

Bi salan beriya niha min ev çîrok di civatekê de guhdarî kiribû.

Min got, bi we re jî parve bikim.

Em kurd qewmekî wisa ne. Gelek caran em bi xwe dizanin ku karê em dikin şaş e.

Lê ligel ku dizanîn jî dest ji karê xwe yê şaş bernadin.

Benîbeşerekî kurd nîn e ku nizane cerdevanî karekî nebaş e. Heta ji nebaşiyê wêdetir, xiyanet e.

Lê dîsa jî dest jê bernadin.

Dîsa jî li pey dijminê xwe diçin.

Dema em gelek bikevin zorê jî dibêjîn; 'em neyarê xwe dixapînin'.

Lê aşkera ye ku em xwe dixapînin...

De baş e heyra min ya xwe got êdî hûn bi kêfa xwe ne.

# Şehîdên hunerê hatin bibîranîn

**Şehîdên çand û hunera kurdî di 11'ê gulanê de hatin bibîranîn. TEV-ÇAND'ê bi wesîleya roja şehîdên çand û hunerê daxuyaniyek weşand û got afirîneriya wan bûye çavkaniya hunera Kurdistanê. Her wiha Gurbet Aydin di 18'emîn salvegera şehadeta xwe de li Qadên Parastinê yên Medyayê hate bibîranîn**

**Ekîn SÎVAS** QENDÎL / ANF

TEV- ÇAND'ê bi wesîleya 11'ê gulanê Roja Bibîranîna Şehîdên Çand û Hunera PKK'ê daxuyaniyek weşand. Tev- Çandê di daxuyaniyê de diyar kir ku hunermendên ku di Têkoşîna Azadiya Kurd de jiyana xwe ji dest dane, bi jiyan û afirînerên xwe, bûne çavkaniyên hunera Kurdistanê.

TEV- ÇAND'ê di daxuyaniyê de destnîşan kir ku Şehîd Mîzgîn (Gurbet Aydin) û di şexsê wê de hemû hunermendên ku di Têkoşîna Azadiya Kurd de jiyana xwe ji dest dane bi bîr tînin. Şehîd Mîzgîn dema ku endama Koma Berxwedan bû tevli refê gerîla bûbû û di 11'ê gulana 1992'yan de li navçeya Tetwana Bedlîsê di pevçûnekê de jiyana xwe ji dest dabû.

Di daxuyaniyê de hate bibîrxistin ku di konferansa TEV-ÇAND'ê ya 1'emîn de 11'ê gulanê weke Roja Bîranîna Şehîdên Çand û Hunera PKK'ê hatiye qebûlkirin. Di berdewamiya daxuyaniyê de wiha hatiye gotin: "Şehîdên me ji bo têkoşîna azadiya me, hêza herî mezin in. Şehîdên me di jiyana xwe de bûne îfadeya çand û hunera PKK'ê. Hunermendên me yên ku şehîd ketin, bi hestên xwe yê şênber tevli refê gerîla bûn û bi awayekî fedaî şerê xwe kirin."

**Hem hunermend hem jî şoreşger e**

Her wiha di daxuyaniya TEV-ÇAND'ê de li ser kesayetiya Gurbet Aydin hatiye sekinandin û di daxuyaniyê de wiha hatiye gotin: "Heval Mîzgîn bû deng, çav û dilê gel û gerîla. Di Kurdistanê de çav û dilê herî mezin, çav û dilê şoreşgeriyê ye. Tu deng qasî dengê şoreşgeriyê ne xweş û ne bi bandor e. Di vê esasê de hevala Mîzgîn hem hunermend û hem jî şoreşger e. Dilê wê yê huneriyê ji bo şoreşê diherikî. Hestên di dilê jina kurd de bi awayekî germ di huner û stranên xwe de îfade dikir. Di vê esasê ew di têkoşîna azadiyê de bû dengê jina azad."

Di dawiya daxuyaniyê wiha hate gotin: "Di serî de em şehîd Mîzgîn û her wiha Ş. Sefkan, Ş. Çiya, Ş. Serhat, Ş. Sarya, Ş.Hêvî, Ş. Yekta, Ş.Delîla, Ş.Halîl û hemû hevalên din bibîr tînin û em soz didin ku em ê girêdayî biranînê wan bin. Di esasa xeta wan ya şoreşgeriya hunerê de, em soz didin ku, ji bo ku tevgera çand û hunera demokratîk a Kurdistanê biafirîne, em ê di nava hewldaneke mezin de bin.



## Li Qadên Parastinê yên Medyayê Gurbet Aydin hate bibîranîn

Hunermenda kurd a şoreşger Gurbet Aydin (Mîzgîn) di 18'emîn salvegera şehadeta xwe de li Qadên Parastinê yên Medyayê hate bibîranîn.

Di şeva bîranîna hemû hunermendên ku di têkoşîna azadiyê de şehîd ketine Koma Amara û Awazê Çiya konser dan. Piştî lîstika Teatrapotamya "Hêvî-Yekta" endamên "Dibistana Çand û Hunerê ya Şehîd Sefkan" soza bi kesên di Têkoşîna Azadiya Kurdistanê de jiyana xwe ji dest dane, dan.

**Di 11'ê gulana 1992'yan de şehîd ket**

Gurbet Aydin ku cihê xwe di nava refên Têkoşîna Azadiya Kurdistanê de girtiye, ji bo pêşketina muzîka kurd gelek xebat meşandiye. Gurbet Aydin, beriya ku biçe çiyayên Kurdistanê, li Ewropayê di nava xebatên çand û hunerê de cih girtibû. Ji bo pêşketina hunera azad a kurd û şoreşgeriyê roleke pêşeng lîstibû.


Gurbet Aydin ku yek ji avakarên Koma Berxwedan e, di demeke şerekî dijwar li Kurdistanê dihat meşandin tevli refên gerîla bû. Demekê li Akademiya Mahsûm Korkmaz a li Bekaayê ma. Gurbet Aydin, piştî çû çiyayê Kurdistanê Berpirsyariya Eyaleta Mêrdînê kiribû. Gurbet Aydin li navçeya Tetwana Bedlîsê di 11'ê gulana 1992'yan de di pevçûnekê de ji bo teslîm nebe, heta guleya xwe ya dawîn şer kiribû û jiyana xwe ji dest dabû.

# Dueta dengbêjî û rockê sermest kir

Koma navdar a muzîka rockê Storybox, bi dengbêjên kurd yên ciwan re konserek da. Konserê ji muzîkhezan eleqeyek mezin dît.

Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) bi organizasyona Productions Newyorkê, dengbêjên kurd ên ciwan bi koma navdar a muzîka rockê Storyboxê derketin ser Dika Haldun Dormen û konserek neyê jibîrkirin dan. Ji dengbêjên ciwan yên kurd Mîhemedê Serhedî, Baran Botan û Ayfer Duzdaş, di konserê de bi Storyboxê dueta rock û ya dengbêjiyê kirin. Ev yek gelekî çû xweşiya muzîkhezan.


Ayfer Duztaş


Her endamekî koma rockê Storyboxê ji welatekî ye.

**Çandên cuda hatin cem hev**

Hunermendên muzîka rock û dengbêjiya çanda kurdan anîn gel hev ahenga çandên cuda raxistin ber çavan. Koma rockê Storyboxê her endamekî wê ji welatekî cuda hatine gel hev, ji endamê komê ye ji Kanadayê Raymond G, Chailes Yenîzelandayî ye, Ed Emerîkayî ye, Bahtiyar ji Ozbekistanê ye û Ashley ê reqase ji Amerîkayê ye. Hunermendên kurd Mihemedê Serhedî, Baran Botan û Ayfer Duzdaş, bi konsera xwe nîşandan ku muzîk zimanê cîhanê yê gerdûnî ye. Konser bi kurdî, îngîlîzî û bi stranên tirkî heta derengiya şevê dom kir. **STENBOL / DÎHA**

## 15'ê gulanê Cejna Zimanê Kurdî ye

Lijneya Ahengîsaz a TZPKurdî bi daxuyanikeyê aşkera kir ku divê gelê kurd 15'ê gulanê roja Cejna Zimanê Kurdî weke cejneke neteweyî pîroz bikin.

Di daxuyaniya TZPKurdî de hatiye destnîşankirin ku di jiyana her gelî de roj û cejnên taybet hene; ji van cejnan hin jê cejnên olî ne û hin jê jî cejnên neteweyî ne. Di daxuyaniyê de hatiye destnîşankirin ku 15'ê Gulanê Roja Cejna Zimanê Kurdî ye û wiha hatiye berdewamkirin: "Em jî wekî TZPKurdî her sal di navbera 15-22'ê gulanê de bi çalakiyên cur bi cur vê cejnê pîroz dikin. Ji ber ku meha gulanê di têkoşîna gelê kurd de xwedî cihekî girîng e, her wiha meha şehîdan e, em jî di meha şehîdan de hefteyekê têkoşîna parastin û pêşxistina zimanê xwe gur dikin û şehîdên xwe jî bi bîr tînin."

**Ne 14'ê gulanê, 15'ê gulanê ye**

Di daxuyaniyê de li ser sedemê ku roja 15'ê gulanê wek cejn hatiye diyarkirin wiha hatiye destnîşankirin: "Roja derketina kovara HAWAR'ê ye. Ev roj roja Cejna Zimanê Kurdî ye. Her çiqas hin derdor 14'ê gulanê wekî roja Cejna Zimanê Kurdî bibînin jî, tu wateyeke 14'ê gulanê ji bo zimanê kurdî tune ye û gelê kurd vê rojê wekî roja cejna zimanê xwe nabîne. Em bang hemû gelê xwe dikin ku îsal ji her salê bêtir di navbera 15-22'yê gulanê de beşdarî çalakiyên Cejna Zimanê Kurdî bibin û têkoşîna parastin û pêşxistina zimanê xwe bigihînin asta herî jor. Roj roja xwedîlêderketina zimanê kurdî ye. Roj roja bilindkirina têkoşîna parastin û pêşxistina zimanê kurdî û bilindkirina têkoşîna azadiya zimanê kurdî ye."

**Çalakiyên bêne lidarxistin**

TZPKurdî li ser çalakiyên ku dê wê hefteyê bêne lidarxistin jî wiha dibêje: "Em ê ji 15'ê gulanê heta 22'ê gulanê bi rengê çalakiyên wekî daxuyaniyên çapemeniyê yên girseyî, panel, semîner, şahî, şano, belavkirina belavokan, pankart û bîlbaordên bi kurdî, serdana gorên kesên navdar û gelek çalakiyên din dê bên lidarxistin. Bernameya me ya çalakiyan dê di rojên pêşiya me de ji raya giştî re bên ragihandin." **AMED**

# Fîlmekî anîsmasyon ê kurd beşdarî Cannesê dibe

Îsal di 62. festîvala Cannesê ya fîlman de kurtefîlmekî kurd jî di beşê fîlmên karton de cih digire. Kurtefîlmê derhênerê kurd ê ciwan Saît Ferat Okçuoglu behsa çîroka zilamekî şikeftan û naskirina wî cîhana modern û hêvîşikestina ji vê cîhanê dike.


Fîlmê "The Utopia" ye bi teknîka 3D hatiye çêkirin ji aliyê derhênerê kurd bi xwe ve hatiye nivîsandin û produktorê wê jî ew bi xwe ye. Fîlmê ku weke cesn fîlmekî fantastîk e dê bi navê "Meksîka û Kurdistanê" di beşê Short Film Corner de beşdarî festîvalê bibe û bê diyalog e.




Derhênerê kurd ê ciwan Sait Ferat Okçuoglu da zanîn ku wî xwestiye ku ev fîlm weke fîlmekî kurd beşdarî festîvalê bibe û ev beşdariya wî û beşdariya fîlmên kurdî ya festîvalên ew qas girîng e, ne ji bo wî bi tenê, her wiha ji bo hemû sînemaya kurdî girîng e.

Îsal tevî Saît Ferat Okçuoglu çar derhênerên kurd di warên cuda de beşdarî festîvalê dibin ku hersêyên din Bahman Ghobadî, Sehram Adîlî û Nezîre Tûran in. *(pukmedia.com)*

# BÎRANÎN


M. Şîrîn Tekîn
03.05.1987 Wan


M. Alî Tekîn
18.11.1999 Nisêbîn

*Ey şagirtên Kawayê Hesinkar*
*Teyrên baz ên Cûdî û Gabar*
*Balîfa we kevir doşeka we axa sar*
*Bîrdoziya we bû tirs û xof*
*Kete nava dilê dijmin û neyar*


Kutbettîn Tekîn
12.05.1993 Bismîl

Li ser navê malbata Tekîn ji girtîgeha Mûşê Sabahattîn Tekîn


Mehmet Tekîn
13.05.1993 Sêwereg

www.arsivakurd.org

HAWAR
12 Gulan 2009 Sêşem

## Hewa germ dibe

Hewa êdî her diçe germ dibe. Li gorî agahiyên meteorolojiyê li bajarên rojava germahiya hewayê dê di navbera 2-4 dereceyan de zêde bibe. Li bakurê rojhilat jî dê baran bibare. Li aliyê din rayedaran ji bo aşîtê welatî hişyar kir. Hate ragihandin ku li bajarên Erzirom, Qers, Erdexan, Agirî, Mûş, Bedlîs, Wan û Colemêrgê ji ber ku berf dihele dibe ku aşît bikeve. Ji ber vê yekê ji welatiyan hate xwestin ku baldar bin û tedbîran bigirin. **ENQERE**

**Tirkiye ji bo parastina nifşên çûkên ku tune dibin tu tedbîran nagire. Ji ber vê yekê jî hejmara çûkên Dudim ku di dema koçberiyê de ji Tirkiyeyê derbas dibin kêm dibe**

# Çûkên koçber tune dibin





Çukên Dudim yên ku li cîhanê hejmara wan tenê 2 hezar e dema ku di ser Tirkiyeyê re derbas dibin ji ber ku nêçîra wan tê kirin tune dibin. Tirkiye ji bo parastina van çûkan tu tedbîran nagire û gelek peymanên navneteweyî ku îmze kirine jî paşguh dike. Nûnerê Komeleya Xwezayê ya Rihayê Turan Çetîn diyar kir ku ji bo parastina van çûkan divê Tirkiye li hin deveran nêçîrê qedexe bike.

Tirkiye li aliyekî ji bo parastina xwezayê bi Ewropayê re protokolan îmze dike lê li aliyê din çûkên ku li Tirkiyeyê derbas dibin û diçin deverên din, tên tunekirin. Çûkên Dudim (Vanellus Gregarius) ku li cîhanê nifşên wan bi tunebûnê re rû bi rû ye dema koçberiya di navbera parzemînên Asya û Afrîkayê de ji ber nêçîrvaniyê zirarê dibînin. Ev çûk herî zêde jî dema ku ji Tirkiyeyê derbas dibin zirarê dibînin. Pispor dibêjen ku sedama tunebûna nifşên van çûkan nêçîrvanî ye. Lê ligel vê yekê jî dewlet tu tedbîran nagire. Li aliyê din li gorî lêkolînan li cîhanê ev çûk tenê nêzî 2 hezar heb mane. D sala 2007'an de li Kazakistanê 3 çûkên Surmelî hatibûn şopandin û di encama vê lêkolînê de derketibû holê ku li ser riya koçberiya van çûkan de Tirkiye jî heye. Her wiha piştî vê li Tirkiyeyê jî lêkolîn hatibû kirin. Di encama lêkolînê de derketibû holê ku li Serekaniyê 3 hezar çûkên Surmelî hene. Ev yek jî nîşan dide ku divê Tirkiye ji bo parastina van çûkan tedbîran bigire. Lê ji ber ku li Tirkiyeyê rayedaran ji bo parastina wan tu tedbîr negirtine niha nifşên wan bi tunebûnê re rû bi rû maye.

**Peymanên navneteweyî nabîne**

Ev yek jî bi awayake aşkera nîşan dide ku Tirkiye peymanên navneteweyê yên ku îzme kiriye nabîne û paşguh dike. Çûkên Dudimê taybetî li Rûsya û Kazakistanê dijîn. Dema ku di navbera parzemînên Asya û Afrîkayê derbas dibin li navçeya Bîsmila Amedê, navçeya Cizîra Şirnexê, navçeya Kopa Mûşê û navçeya Serekaniya Rihayê dimînin. Dema ku li var deran derbas dibin bi sedan çûk ji aliyê nêçîrvanan ve tên kuştin.

Nûnerê Komeleya Xwezayê ya Rihayê Turan Çetîn diyar kir ku ev çûk bi sedan salan e dema koçberiyê de ji Tirkiyeyê derbas dibe. Lê dewlat ji bo parastina wan tu tedbîran nagire. Çetîr got ku ev çûk bêhtir li zeviyên ku hatine çandin dimînin û ji ber vê yekê jî bi rehetî dibin hedefa nêçîrvanan. Ji ber vê yekê jî Çetîn got ku divê dewlet li hin deveran ji bo parastina van çûkan nêçîrê qedexe bike. Çetîn diyar kir ku ew inha jî bo ku hejmara van çûkan tespît bikin li navçeya Serêkaniyê xebatên xwe didomînin.

Ji bilî çûkên Dudim qazên Sakarca (Anser erythropus) jî li Tirkiyeyê di bin xetereyê de ne. Ev qazên biçûk li Ewropayê tên parastin lê dema ku ji Tirkiyeyê derbas dibin dibin hedefa nêçîrvanan û tên kuştin. Ji ber ku welatên Ewropayê ev rewş ditin riya koçberiya van qazan guherandibûn. Ligel serîlêdanên saziyên xwazeyê jî rayedaran tu tedbîr negirtibûn. **ŞIRNEX / DÎHA**

### Hejmara wan kêm dibe

Nûnerê Komeleya Xwezayê Çetîn der barê mijarê de got ku li cîhanê hejmara çûkên Dudim her diçe kêm dibe û tenê bi hezaran ve hejmara wan tê îfadekirin. Her wiha Çetîn diyar kir ku di warê tunekirina nifşên wan çûkan de rola Tirkiyeyê pir giring e. Ji ber vê yekê jî divê tedbîran bigire. Çetîn got ku Tirkiye peyman û protokolên navneteweyî ku îmze kirine jî bin pê dike û wiha axivî: "Çûkên Surmelî herî zêde li Tirkiyeyê tên kuştin. Her wiha dermankirina nezanî û peyn (gubre) ji nifşên çûkan bi tunebûnê re rû bi rû dihêle. Ji ber vê yekê jî divê dewlet ji bo parastina van çûkan projeyan pêş bixe."



## Bajarê herî bêkalîte Bexda ye!

Li 215 bajarên cihanê lêkolîna kalîteya jiyanê hate kirin. Di lêkolînê de Viyana bajarê herî bi kalîte û Bexda jî bajarê herî bêkalîte derket. Şîrketa Mercer ku di warê çavkaniya mirov de şêwirmendiya rêverberiyê dike li hemû metropol û peytextên cihanê rêzelêpirsînekê kir û encam diyar kir. Mercer her sal vê lêkolînê dike û li gorî 10 kategorî û 39 faktoran kalîteya jiyanê tesbît dike. Pûanên lêkolînê li gorî standardên bajarê New Yorkê tên tesbîtkirin. Bajarê ku 100 pûan bigire yê herî bikalîte tê hilbijartin. New York îsal di rêza 49'an de ye.

**Viyana bajarê herî bikalîte ye**

Li gorî vê lêpirsînê peytexta Awisturyayê Viyana di warê kalîteya jiyanê de bû bajarê yekem. Viyana sala borî di rêza duyem de bû. Bajarê yekem yê sala borî Zuricha Swîsreyê bû. Zurich îsal daket dereca duyem û Cenevre jî bû bajarê sêyem.

Peytexta Iraqê Bexda di nav 215 bajarên cihanê de ya herî bêkalîte derket. Stenbola Tirkiyê jî di rêza 121'an de cih girt.

Li gorî encamên Lêkolîna Kalîte ya Jiyanê ya Şîrketa Mercer di warê parzemînî de bajarên Ewrûpayê di rêzê pêşîn de cih digrin. 10 bajarên pêşîn ji welatên Awrûpa ne.

Wiyana, piştî çakdariyên rewşa civakî û siyasî yên Awusturya, di astê cihanê de bû bajarê xwedî kalîteya jiyanê ya herî bilind. Di rêza lîsteyê de 9 bajarên dumahîkê tên bajarên Almanya û Swîsre ne. Bi vî awayî 10 bajarên herî bikalîte yên cihanê ji Ewropa hatin hilbijartin.

Li gorî lêkolînê jiyana bi kalîte ya parzemîna Amerîka jî li Kanadayê ye. Bajarê Vancouver di nav pênc bajarên pêşîn yên lîsteyê de cih digire. Li gorî lîsteya Mercerê ji bajarên populer yên cihanê Washington û New York di rêza 44 û 49an de, Paris di rêza 33, Londra 38, Milano 41, Madrid 48 û Los Angeles jî rêza 59an de cih digre.

**Bexda bajarê jiyana bê kalîte**

Li Asya û Pasîfîk'ê bajarê Auckland li heremê bajarê herî bi kalîte ye. Bi xwetên giştî bajarên vê heremê cihê xwe yên sala borî parastine. Singapûr tenê li gor sala borî 6 rêz hatiye pêş û ji rêza 116an derketiye rêza 113an. Sedemê vê yekê jî olîmpiyatên sala borî yên Pekîn'ê ne.

Li gor lêkolîna Mercer'ê li Rojhilata Navîn bajarê Dubayî yê herî bikalîte ye. Di rêza Mercer'ê de Bexda li rêza herî dawîn ya lîsteyê de ye.

Bajarê Afrîka Başûr ku di vê parzemînê de herî bikalîte ye Cape Town e. Ev bajar di rêza îsal de hînekî din jî paşve çû. Sedemê vê yekê şîddeta ku sala borî li vî welatî derketiye ye.

Di lêkolîna Mercerê de derfet û jêrgehên wek temînkirina elektrîkê, ya avê, xizmetguzariyên telefon û postayê, ragehadin, çûnûhatin, trafîka bejayî, ya deryayî û ya hewayî cihên herî serekî digrin.

Li gorî krîterên trafîka hawayî jî Sîngapûr bajarê herî baş yê cihanê ye. Piştî wê Munih a Almanya û Kopenhagen a Danîmarka tê. Bajarên Japonya Tsukaba û Yokohama, Dusseldorf, Vancouver û Frankfurt jî di vê rêzê de ne. Bexda dîsa di rêza herî binî ya vê kategoriye de cih digre. **BONN**

## Îsot ji bo tenduristiyê baş e

**Madeya alkaloît ya bi navê kapsaisin ku di hundirê îsotê de heye di serî de ji bo pençeşêrê û gelek nexweşiyên din baş e. Pisporan diyar kir ku di hundirê îsotê sor de madeya ku kêmê ji holê radike heye . Ev made êşê jî dibire. Her wiha pêşî li pençeşêre jî digire. Pisporan diyar kir ku ji bilî vê îsot ji bo kolestrolê, made jî baş e. Her wiha mîkroban jî dikûje. Pisporandiyar kir ku ligel ku îsot ji bo tenduristiya mirovan ewqas baş e ji li Tirkiyeyê li ser îsotê zêde lêkolîn nayê kirin. Bêhtir zanyar û pisporên rojavayî û Rojhilatê dûr li ser lêkolînê dikin û îsot bêhtin bala wan dikêşe. RIHA**



## Beriya azmûnê çûn seyranê

Xwendekarên ku li Mala Çand û Piştgiriya Perwerdehiyê ya 500 Evlera Peyasê ji bo azmûnen SBS'ê amadekariyê dikin bi hev re çûn seyranê.

Kursali mala perwerdehiyê ji aliyê Şaredariya Kayapinarê ve tê dayîn. Xwendekarên kursê bi hev re çûn qada seyranê ya Şaredariya Yenîşehîra Amedê. Li vir xwendekaran beriya azmûnan demeke xweş derbas kir. Şaredarê Kayapinarê Zulkuf Karatekîn, endamên meclîsa şaredariyê û malbatên xwendekaran jî bi xwendekaran re çûn seyranê. Şaredar Karatekîn di seyranê de bi xwendekaran re sohbet kir û got ku heta ji destê wan bê ew ê alîkariyê bidin xwendekaran. **AMED**



*Xwendekarên Mala Çand û piştgiriya Perwerdehiyê li seyranê digel malbatên xwe demeke xweş derbas kirin.*

## Şewba berezan her diçe belav dibe

Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) der barê şewba berezan de daxuyaniyek da. Li gorî daxuyaniya rêxistinê li cîhanê şewba berezan li 30 welatan belav bûye. Heta niha di encama vê nexweşiyê de 53 kesan jiyana xwe ji dest da û herî kêm 4 hezar û 657 kes jî nexweş in.

Vîrusa H1N1 ango vîrusa şewba berezan her diçe belav dibe. Heta niha li Meksîkayê 48, li Amerîkayê 3 kes, li Kanadayê mesek û li Costa Ricayê jî kesekî jiyana xwe ji dest da. Her wiha li gorî daneyê WHO'yê li Meksîkayê hezar û 626 kes, li Amerîkaye 2 hezar û 532 kes û Kanadayê jî 286 kes jî nexweş in. Li gorî rayedarên Meksîkayê kesên ku jiyana xwe ji dest dane ji sedî 84 temenê wan di navbera 20-54 de ye. **BRUKSEL**